


## Kamera pênûsa wê ye

Filmografyaya Agnes Vardayê xwedî naverokeke ku di her filmekê de xwe ji nû ve diafirîne û nû dike. Bi filmê xwe yê bi navê La Pointe-Courteyê de dest bi derhênêriyê dike û di filmên xwe de li hemberî kevneşopiya giştî ya sînemayê disekine... *R.2*



## Destana neteweyekê

Dengbêj dest bi destanê kiriye, hêdî hêdî guhên xwe bel dikim, ji ber ku tiştek cuda heye, ne wek destanên em dizanin e, ne wek ew destanên eşqê ye, çîrok weke wan naherike. "Ev destana malbata me ye, çîroka Ferx û Sitiyê ye..." ***Kenan Colemêrgî / R.5***




## Neqşeke wateyî: Tarîkoj

Di 'Tarîkoj'ê de nivîskar-helbestkar Hecî Nehsan li ser jiyan, şer, bîrdozî, huner, helbest, wêje, evîn, bêrîkirin û hwd dîtinên kurt vedibêje. Ji sala 2012'an heya 2017'an fikrên xwe bi kurtasî nîşe kirine, komî ser hev kirine... ***Yaşar Aslan / R.11***


# xwebûn

29 ADAR-4 NÎSAN 2021 HEJMAR: 67 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Niha fikar zêdetir bûn

Ji bo tecrîd were rakirin bi mehan e girtî di greva birçîbûnê de ne, bi milyonan kes beşdarî pîrozbahiyên Newrozê bûn li Ocalan xwedî derketin. Herî dawî Mehmet Ocalan bi birayê xwe Abdullah Ocalan re bi telefonê axivî û di axaftinê de Ocalan dema behsa bêhiqûqiyan kir telefon hat qutkirin. Piştî qatkirina telefonê fikar zêdetir bûn û daxwaz hevdîtina rûbirû ye... *R.3*



### Parêzeran xwest hevdîtin bê kirin

*Parêzerên rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan têkildarî qutkirina telefonê daxuyanî dan çapemeniyê û wiha gotin: "Daxwaza me ya hevdîtina bi lezgînî ya bi birêz Ocalan re hêj berdewam e. Lewra birêz Ocalan jî di dawiya hevdîtina xwe de diyar kir ku ew jî bicihneanîna daxwaza hevdîtinê qebûl nake û ev rewş li dijî hiqûqê ye."...* ***R.3***

## Malbata Şenyaşar edaletê dixwaze

Li navçeya Pirsusê ya Rihayê 3 sal berê di 14'e hezîrana 2018'an de beriya hilbijartinên 24'ê hezîranê xizmên parlamenterê AKP'ê Îbrahîm Halîl Yildiz êrîşî dikana malbata Şenyaşar kiribûn. Di êrîşê de bav Hacî Esvet Şenyaşar kurên wî Celal û Adil Şenyaşar hatibûn kuştin. Emîne Şenyaşar û kurê wê Ferît Şenyaşar li dijî neheqî û zilmê li ber Edliyeya Rihayê dest bi çalakiya 'Nobeda Edaletê' kirin û zêdetirî 3 hefte ne li ber edliyeyê ne. Ligel ku malbat gelek caran rastî êrîşa polîsan hat û hat binçavkirin jî dîsa jî dev ji daxwaza edaletê bernadin. Dayik ji bin çavan derket û vê carê jî berê xwe da cihê jidayikbûna H. Îbrahîm, Golamasiyan a dîrokî ya lê hatibû şewitandin ziyaret kirin û li vê derê daxwaza xwe ya "Edaletê" anî ziman. Malbatê piştre dîsa ji bo edaletê berê xwe da Edliyeya Rihayê... *R.3*



# 'Tiştek şûna dengbêjên me nagire'

Vê hefteyê jî hunermend Xelîl Xemgîn pirsên rojnameya me bersivandin. Hunermend têkildarî çêj û qalîteya stranan yên berê û yên niha wiha axivî: "Ji tama stranê bêhtir her diçe karekterê hunermend jî diguhere. Ev guhertin jî tesîrê li stranan dike ji ber yê ku stranê çêdike hunermend e. Ku dilê te bi evînek neşewite bi evînek neêşe, tu yê çiqas bikaribî li ser wê evînê stranek binivîsî û ew ê çiqas bibandor be." Xemgîn got ku tiştek şûna dengbêjan nagire û wiha domand: "Tiştek ku şûna klasîkên me û dengbêjên me bigire tune. Di awazên ku min çêkirine de jî gelek kêmasî hene. Lê tişta herî kambax û xerab a ku min diêşîne ew e ku min stranên gelêrî digirtin û peyvên wan diguhertin."... ***Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4***

KURDISTAN LEZGIYEVA

## Cîhana lîberal û rewşa Rûsya...

***R.12***

## Hêz û serweriya veguherînê

Hêz, tenê bi bedenê bi dest nakeve, jê wêdatir, ya bi bandor, bi riya hiş û zanînê bidestxistina wê ye. Kesekî ku ne tenê hêza xwe yan jî yekkesî, ya gelek kesan bigihîne hev cuda ye. Xwedan erkeke girîng e. Ew ê ku li dewsa hêza yekkesî hêza civatekê, komekê, rêxistinekê bi cih bike, hem hêza xwe xurt dike, hem jî hêzeke nû diafirîne. Civakîbûn û hêza komelî deriyê desthilatdariyeke nû vedike. Ji bo qanehkirina takekesên xwedî yek hêzan bigihîne hev û bike hêza komî, divê zanîna kesê rêberiyê dike cuda be, planên wî, pêşkêşiyên wî xurt bin. Hêza qanehkirinê zêde be... ***Ehmed Pelda / R.6***

## Ceynika bêderde

Ceynikê cirê domanî nêbenê, rojê hêlê Heqî ra pê manena, dîganîya. Vana "Heqî çend serî yo domanî nêdayî mi. Ez nî pirênê domanê xo berî ceyniyêde bêderde cirê biderzo. Belkî Heq derdê nî dergûşê mi nêdo." Bena hetê kamcî ceynike pêro ci rê derdê xo qesî kenê, nêdana ci. Nêdana ci, ci ra vanê "Şo filan ceyniyê hanîka filan ca de, derdê aye çînîyo, a bêderd a." A bêderd a... Na dana raye şona kewer kûna, ceynike kewer kena ya. Kewer kena ya ke ceynike binê lingan ra hetanê sere sarî pêro pîya ebe zernan xemelnawa. Na ver ra matê ci manena. Ceynike vana "Bê zere ti qeyî nêna zere."... ***Tûrabî Kîşîn / R.9***

## 'EZDA' malzarokeke derbkirî ye

Her serdem xwedî sembolên gelekî taybet in. Bi gelek remz û nîşanan tê nasîn û bibîranîn. Carinan çîroka pîrejinekê, carinan kilama dengbêjekî, stranek, helbestek û carinan jî bi 'dolmîşeke şîn'... EZDA çîroka serdemeke tijî êş a bajarekî ye. Bi romana Rengîn Kardelen a bi navê EZDA, nifşek ji nişka ve li zarokatiya xwe, li ciwaniya xwe vedigere. Çîrokeke gelekî tê zanîn a dawiya sedsala borî ye ku mekan Amed e. EZDA jî bêhemdê me, me dibe û li sûka Amedê digerîne û rê li ber 'serboriyên' çiziniyê ji dil tîne vedike. Her çiqas çîrok bi awayekî sembolîk... ***Sîdar Jîr / R.11***

## Vîrûsa koronayê

Di dema vîrûsa koronayê de, di nav însanan de, tevgerên cuda cuda jî çêbûn. Dîmenên wiha jî hebûn: xweşbûn an nexweşbûn, lê hebûn. Solfiroşê taxê, nexweşî ne xema wî ye, rokê dev û pozê xwe girtiye. Xuya ye ew kalê emrê xwe li ber dikanê bibuhurîne; şev û roja bi serhev vekin û bidin wî û bêjin tu dikarî heta hetayê gav û saet li ber dikanê bî, wek ku xelata herî mezin a dinyayê bidinê. Ew deqeyek neqedexekirî bibîne li dikanê ye... ***Xecê Bîşeng / R.12***



## Şopa doza Qazî Mihemed

Şeva 31'ê adara 1947'an li qada Çar Çirayê ya bajarê Mahabadê dîrokê ew kêlî bi rindî tomar kirine. Wê şevê dîroka rojhilatê Kurdistanê kirasekî nû kire ber xwe. Pêvajoyeke nû dest pê kir... ***Kakşar Oremar / R.8***

## Xewnereşka desthilatdariyê

Ji dema ku Tirkiye Peymana Stenbolê îmze kiriye heta niha ev peyman ji rojevê neketiye. Peyman heta sala borî ji ber ku nedihat bicihanîn û tundî û kuştinên jinan di rojevê de bûn, lê di nav salekê de hem ji ber tundî û qetlîamên jinan ên hatine asta qirkirina zayendî, hem jî ji ber ku ji hêla zilamên AKP-MHP'ê ve dihat xwestin were betalkirin, di rojev û çalakiyên jinan de bû. Peymana Stenbolê çi bû? Tê de çi hebû? Çima dema hat îmzekirin rayedarên AKP'î bi şanazî peyman dan nasîn û niha li şûna peymanê bidin sepandin xwe ji peymanê vekişandin? Taybetmendiya peymanê ya sereke ew e ku di qada navneteweyî de yekem car peymaneke girêdayî dijderketina li ser tundiya jinan e. Bi peymanê re tundiya li ser jinan bi zelalî weke binpêkirina mafên mirovan û cudakiriyê tê pênasekirin... ***Dûrket Suren / R.2***

# Peymana Stenbolê: Xewnereşka desthilatdariyê



Dûrket Suren

**Jin xewnereşka desthilatdariyê ne. Ew çi bike jî jin dev ji maf, têkoşîn û azadiya xwe bernadin. Bi salan e saziyên wan hatin girtin, mafên wan ên esasî ji wan hatin dizîn, berê wan dan zindanan, lê tu carî serî li hemberî vê desthilatdariya mêran netewandin**

'Tirkiye ji Peymana Stenbolê vekişiya!' Şev nîvê şevê ajansên nûçeyan bi sernaveke wisa nûçeya 'darbeya şevê' radigihandin. Nîvê şevê ya 20'ê Adarê... 3 roj beriya wê parlamenteriya parlamenterê HDP'ê Omer Faruk Gergerlîoglu hatibû betalkirin, der barê HDP'ê de doza girtinê hatibû vekirin, rojeva siyaseta Tirkiyeyê di nav kelekelê de bû. Ev krîz têrê desthilatdariya Tirkiyeyê nekiribû û careke din bi biryanameyeke serokkomariyê ya nîvê şevê li dijî jiyana jinan darbeyek kirin!

Ji dema ku Tirkiye Peymana Stenbolê îmze kiriye heta niha ev peyman ji rojevê neketiye. Peymana Stenbolê heta sala borî ji ber ku nedihat bicihanîn û tundî û kuştinên jinan di rojevê de bûn, lê di nav salekê de hem ji ber tundî û qetlîamên jinan ên hatine asta qirkirina zayendî, hem jî ji ber ku ji hêla zilamên AKP-MHP'ê ve dihat xwestin were betalkirin di rojev û çalakiyên jinan de bû. Peymana Stenbolê çi bû? Çi heye tê de? Çima dema hat îmzekirin rayedarên AKP'î bi şanazî peymanê dan nasîn û niha li şûna peymanê bidin sepandin xwe ji peymanê vekişandin?

**Taybetmendiya sereke ya peymanê**

Piştî têkoşîna salan a jinan Peymana Stenbolê yanî "Peymana Konseya Ewropayê Ya Pêşîlêgirtin û Têkoşîna Li Dijî Tundiya Jinan û Tundiya Di Nav Malê De" di 11'ê Gulana 2011'an de li Tirkiyeyê ji îmzeyê re hat vekirin. Meclisa Tirkiyeyê peyman di 14'ê Adarê ya 2012'an de qebûl kir û di 1'ê Tebaxa 2014'an de jî xist meriyetê. Ji ber ku destpêkê Tirkiye peyman îmze kiriye, navê wê Peymana Stenbolê ma. Heta tîrmeha 2020'î di nav 46 welat û ji hêla Yekitiya Ewropayê ve peyman hatiye qebûlkirin û li 34 welatan jî hatiye erêkirin.

Taybetmendiya peymanê ya sereke ew e ku di qada navneteweyî de yekem car peymaneke girêdayî dijderketina li ser tundiya jinan e. Bi peymanê re tundiya li ser jinan cara yekemîn bi zelalî weke binpêkirina mafên mirovan û cudakariyê tê pênasekirin. Ji bo jinan li dijî tundî, cudakarî û li dijî binpêkirina mafên mirovan mîna makeqanûnekê ye Peymana Stenbolê. Li dijî tundiya derûnî, aborî, şopandina bi israr, tundiya fizîkî, tecawiz, zewaca bi zorê, suneta jinan, ferzkirina kurtajê, xesandina bi zorê, zayendparêzî... yanî bi kurtasî li dijî her cure tundiyê ye û ji bo bergiriyê li dewletan avakirina mekanîzmayan û polîtîkayan dide ferzkirin. Li derve, di jiyana taybet de, li ku be ferq nake gefa tundiyê di pênaseya binpêkirina mafên mirovan û cudakariyê de tê fêmkirin û li dijî wê disekine. Mesela, di çarçoveya peymanê de tundiya di nav malê de weke xalên din yek bi yek hatiye vekirin û têkoşîna li dijî tundiyê bi zelalî dide nasîn. Jin bi wî zilamî re di heman malê de bijî yan nejî (zewicandî be, veqetandî be, destgirtî be, hwd.) li ser bingeha parastina jinan radiweste û li gorî mafên mirovan dixwaze cezayên bi bandor li kiryaran were birîn. Yek bi yek hemû cureyên tundiya li ser jinan û di heman demê de tundiya ji ber zayendparêziyê pêk tê rave dike û ji bo bidawîkirinê jî hûkmên sepandinê destnîşan dike. Peyman dibêje ku çavkaniya tundiya li ser jinan ji ber newekheviya zayendiyê pêk tê. Ev jî dide nîşandan ku heta niha ji bo wekheviya zayendan peymaneke wisa xurt nehatiye avakirin. Di her xalên hatine ravekirin de hêza pêşiya tundiyê bigire heye. Ji ber vê yekê Peymana Stenbolê ji bo jinan ne tenê peymaneke ku di nav dewletan de ji îmzekirina kaxizekê derbasdar e. Destkeftiya têkoşîna jinan a ku bi salan di qada navneteweyî de dane ye. Di îmzekirina wê peymanê de giyana sedan jinên hatine qetilkirin û rastî tundiyê hatine hene. Qêrîna jinên ku dewletê guhên xwe jê re girtibû hene.

Di peymanê de xala "çand, adet, kevneşopî, namûs" dê nebe hinceta tundiya li ser jinan yek ji xala peymanê ye ku zilamên kevneperest ên AKP'ê û berdewamên wê aciz kirin. Xwe spartin hincetên olî û gotin peyman civakê ji "nirxên wê" dûr dixîne. Her çend navê LGBTÎ+'yan derbas nabe jî (di vir de dixwazim destnîşan bikim ku mafê tu kesî nîn e, zayendan hedef nîşan bide û cudakariyê li dijî wan bike) îdia kir ku peyman ji bo rewakirina hevzayendiyê ye û ji ber wê jî divê were betalkirin. Di vir de ger em behsa rewakirinekê bikin, ew jî parastina van zilaman e ku kuştinên jinan ên bi hinceta "çand, adet, kevneşopî, namûsê" pêk hatine diparêzin. Piştî ku gotin Peymana Stenbolê "pergala malbatê xera dike" rêjeya cînayet û tundiyê saet bi saet zêde bû. Qereqol û dadgeh hê bêtir bûn navenda ewlehiya kiryarên jinan. Zilaman jinan kuşt, dewletê zilaman parast. Lê dema jinên ji ber tundiya zilaman mafê xweparastinê bi kar anîn hatin girtin, cezakirin û teşhîrkirin. Li gorî wan bila jin di malan de, di kolanan de rastî tundiyê bên, bila werin kuştin, bila rastî cudakariyê bên, lê bila xaniyên wan, bila pergala malbata wan a jinan weke koleya zilam û dewletê dibîne xera nebe. Ev tê wê wateyê ku dewlet bi vî awayî vê yekê dibêje: ez ê weke dewlet jinan mehkûmî tundiya ku weke xwezayî bê dîtin bikim û mecbûrî zilaman bikim. Dema jin rastî tundiyê bê û bixwaze ji zilamî veqete ez ê pêşiya wê bigirim û pergala malbata xwe ya pîroz biparêzim!




**Piştî xwevekişandina ji peymanê**

Ew xaniyên ku tê de ewlehiya jin û zarokan tune ye, ew xaniyên ku xwîna jinan dirije, ew pergala ku lê xwedî derdikevin û diparêzin bila ji kokê ve xera bibe! Piştî vekişandina ji Peymana Stenbolê, tenê di nav 24 saetan de 6 jinên din hatin qetilkirin! Fedî nakin, xeman nakin, lê bila baş bizanin ku di her kuştina jinekê de êdî destên wan ên qirêj hene û jin dê vê yekê tu carî ji bîr nekin!

Di makeqanûna Tirkiyeyê de hukmê betalkirina peymaneke navneteweyî ya serokkomar heye yan nîn e, serokkomar vîna meclisê binpê kiriye yan nekiriye pir tê nîqaşkirin, pir tê rexnekirin. A rastî jixwe bo rejîmê ne qanûn, ne peyman, ne jî rêgezên mafên mirovan ên navneteweyî ne derbasdar in. Bi taybetî jî di van çend salên dawî de ka kîjan qanûn, kîjan makeqanûn, kîjan biryarên di qada navneteweyî de yên hatine girtin tên sepandin îja rejîma yekperest niha guh bide qanûn û peymanan. Ha ez bêjim ev kirinên wî ne ku ji ber hêz û qeweta wî ne, hemû ji ber lawazbûna rejîma wî ya mêrperest e ku têkçûna xwe dibîne.

Jin xewnereşka desthilatdariyê ne. Ew çi bike jî jin dev ji maf, têkoşîn û azadiya xwe bernadin. Bi salan in saziyên wan hatin girtin, mafên wan ên esasî ji wan hatin dizîn, berê wan dan zindanan, lê tu carî serî li hemberî vê desthilatdariya mêran netewandin. Ji ber vê jî heta dawiyê bawer dikim ku dawiya vê rejîmê dê bi saya têkoşîna jinan were. Di her çalakî û daxuyaniyên jinan de dihat destnîşankirin ku Peymana Stenbolê dide jiyandin, ji niha û şûn de jî ji bo careke din destkeftiya xwe ya bi salan bi dest bixin dê bibêjin "Em ê Peymana Stenbolê Bidin Jiyandin!"

# Kamera çav û pênûsa wê bû

Bêrîvan Kayi

Dema em bala xwe didin dîrokê tişta ku herî zêde derdikeve pêşiya me, nedîtin û tunehesibandina jinan li hemû qadên jiyanê ye. Her çiqas di bingeha afirandin û avakirina jiyanê de jinan cih girtibe jî, ev yek an qet nehatiye nivîsîn an jî pir kêm hatiye nivîsîn. Rastiya vê yekê em herî zêde di qada polîtîka, aborî, felsefeyê heta qada çand, huner, wêje û sînemayê û hwd. dibînin.



Lê tê zanîn ku li dijî hişmendiya baviksalar a ku rastî berevajî kirine, bi hezaran jin carinan bi pênûsên xwe, carinan bi jiyana xwe, carinan bi zanistê li ber xwe dane. Yek ji van jinan ku bi kameraya xwe li ber xwe daye jî derhênera jin a femînîst Agnes Vardayê ye.

**Kleo û Mona**

Agnes Varda di nav pergala desthilatdariyê de hunermendeke ku bi karekterên xwe yên wek Kleo û Monayê li hember hişmendiya jinan tenê wek xwişk, hevjîn, destgirtî, dayik û hwd. disekine. Yanî em Vardayê di filmên ku wê bixwe çêkirine de, li dijî 'malîkirina' jinên li nav çar dîwaran li ber xwe dide dibînin.

**Femînîzm dike nav sînemayê**

Em dikarin bêjin ku filmografyaya Vardayê xwedî naverokeke ku di her filmekê de xwe ji nû ve diafirîne û nû dike. Varda bi filma xwe ya bi navê La Pointe-Courteyê dest bi derhênêriyê dike û di hemû filmên xwe de li hember kevneşopiya giştî ya di sinemayê de disekine. Di sînemayê de xeta ku derhênêrên mêr danîne rûniştandin perdeya ku di navbera film û rastiyê de hatiye kişandin, rolên zayendperest û karekterên jin ku ji aliyê mêran ve hatine amadekirin tev ji holê radike. Bi taybetî Agnes Varda di sala 1955'an de dema filma xwe ya yekemîn çêdike derba herî mezin li hişmendiya ku karekterên jin tenê bi destê mêr tên avakirin, dixe. Varda femînîzmê dike sektora sînemayê.

**Balê dikişîne ser Vîetnamê**

Varda helbet ne tenê şikandina qalibên sektora sînamayê û hişmendiya baviksalar a di karekterê jinan de biryar dide, her wiha balê dikişîne ser mijarên çînên bindest û kapîtalîzmê jî. Di belgefilmên xwe de ji jinên hunermend ên hatine paşguhkirin, çîrokên karker û gundiyan û bûyerên wek Vîetnamê de jî balê dikişîne ser mijarên civakî.

**Nasnameyeke bihêz ava dike**

Agnes Vardaya ku di sînemayê de wek tevgera femînîzmê û Herka Nû ya Fransayê jî tê binavkirin bi filmên xwe xeteke azadparêz, wêrek, nasnameyeke xwemalî û bihêz di sînameyê de ava dike. Bi vî awayî dibe pêşengek. Li gel vê nasnameya taybet a Vardayê ew bixwe jî xwedî nasnameyake cuda û rengîn ne.

**Kadraja wê li jiyana rojane ye**

Derhênêra femînîst beriya ku dest bi derhêneriyê bike wê wênekêşî kiriye û gelek caran rahiştiye kameraya xwe û derketiye kuçeyan. Helbet vê yekê jî kiriye ku berê kameraya wê tim li kuçe û jiyana rojane be. Di gelek filmên wê de karên rojane û bûyerên li kuçeyan derkevin pêşberî bîneran. Kadraja wê ji vî alî ve wek kadraja kuçeyan jî tê pênasekirin.

Agnes Varda ku di nav pergala desthilatdariyê de bi filmên xwe li ber xwe daye, di 29'ê adara 2019'an jiyana xw ji dest dide.

# Hevdîtina bi telefonê hat qutkirin

# Fikarên gel zêdetir bûn

Navenda Nûçeyan



Bi mehan e li girtîgehan ji bo tecrîd were rakirin çalakiyên greva birçîbûnê tên lidarxistin. Herî dawî Mehmet Ocalan bi birayê xwe Abdullah Ocalan re bi telefonê axivî û axaftina telefonê di nîvî de hat qutkirin û fikarên civakê yên ji bo Ocalan zêdetir bûn

Ji bo tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan were rakirin û zextên li girtîgehan bi dawî bibin 4 meh in li dehan girtîgehan girtî di greva birçîbûnê de ne û grev hêj dewam dikin. Her wiha herî dawî li ser medyaya civakî têkildarî Ocalan hinek parvekirin hatin kirin û piştre di serî de parêzerên Ocalan, partiyên siyasî, saziyên civakî û bi çalakiyên protesteyoyî hat xwestin ku bi Ocalan re hevdîteneke rûbirû were kirin.

Herî dawî di 24'ê adarê de ji Girtîgeha Îmraliyê ji Mehmet Ocalan re telefon hatiye vekirin û gotine ku di 25'ê mijdarê saet 13:45'an de biçe Serdozgeriya Komarê ya Rihayê û bi birayê xwe re hevdîtinê bike. Mehmet Ocalan têkildarî mijarê ji Ajansa Mezopotamyayê (MA) re axivî û got ku ji girtîgehê telefon vekirine û gotine 25'ê adarê, saet 18:00'an de li Edliyeya Rihayê li odeyeke jêr bi Ocalan re bi telefonê axiviye, dengekî zirav bû.

**Behsa bêhiqûqiyan kir**

Mehmet Ocalan anî ziman ku telefon lê daye û bi vekirinê re kekê wî Ocalan jê ev pirs kirine: "Tu çawa hatiyî vir? Kê tu aniye? Çawa çêbû? Tu ji ku digerî?" Mehmet Ocalan der barê hevdîtinê de axaftina xwe wiha domand: "Kekê min got 'Ji van tiştên diqewimin re hem tu hem jî dewlet xeletiyê dike. Sedema wê ev e; ev salek e bi tu awayî hevdîtin nayê kirin. Tişta tê kirin ne di hiqûqa dewletê de ne jî di tu hiqûqek din de heye. Hatina te pir xeletî ye û pir talûke ye. Dewlet jî pir talûke ye. Ev ne tiştek rast e. Heke hevdîtinek bibe divê di çarçoveya hiqûqî de bibe. Piştî salekê li ser daxwazên wan bi rêya telefonê hevdîtin nabe.' Serok dubare dubare got 'Ev tişta hûn dikin pir şaş e. Dewlet jî şaş dileyîze û hûn jî. Ev ne hiqûqî ye, ne rast e jî. Ev yek qet û qet nayê qebûlkirin. Ev yek di heman demê de pir talûke ye. Gelo hûn di ferqa wê de ne ku çi dikin? Ez dixwazim parêzerên min werin vir û bi min re hevdîtinê bikin. Ev ne tiştek hiqûqî ye. Ev 22 sal in li vir im. Ev pirsgirêk di siberojê de wê çawa bibe? Ev pirsgirêk encax bi hiqûqî dikare were çareserkirin. Çima nayên vir? Heke hevdîtinek bibe jî divê bi parêzeran re bibe. Çimkî ev rewş hem siyasî ye hem jî hiqûqî ye."

Mehmet Ocalan destnîşan kir ku li ser qutbûna telefonê ji rayedarên li wir amade bûne re rewş ragihandiye û wan jî xwestiye ew bisekine û wiha domand: "Piştî re telefonek din jî hat. Yê geriya kesek din bû. Ji min re got divê tu bisekinî û divê ez wir neterikînim. Nêzî 10-15 deqîqeyan sekinîm. Piştî re min got telefon nayê. Min ji rayedarên wir re jî ragihand. Piştî re ji min re gotin ku hevdîtin qediyaye."

Mehmet Ocalan bang li CPT, Konseya Ewropayê, rewşenbîr û parazvanên mafên mirovan kir ku li hemberî vê bêhiqûqiyê helwestê nîşan bidin.

**Parêzeran daxwaz dubare kir**

Buroya Hiqûqê ya Sedsalê têkildarî mijarê daxuyanî da û wiha got: "Daxwaza me ya hevdîtina bi lezgînî ya bi birêz Ocalan re hêj berdewam e. Lewra birêz Ocalan jî di dawiya hevdîtina xwe de diyar kir ku ew jî bicihneanîna daxwaza hevdîtinê qebûl nake û ev rewş li dijî hiqûqê ye. Piştî vê hevdîtin hatiye qutkirin. Em van geşedanan bi raya giştî re parve dikin û bang li rayedaran dikin ku bila li gorî hiqûqê tevbigerin û berpirsiyarê werbigirin."

Her wiha Hamîlî Yildirim ê li gel Ocalan dimîne jî hevdîtinek kurt kir û telefona wî jî hatiye qutkirin. Veysî Aktaş û Omer Hayrî Konar jî yên li gel Ocalan dimînin bi helwesta protestokirina tecrîdê hevdîtin red kirin.

## Demildest hevdîtina rûbirû

Berdevka HDP'ê Ebrû Gunay têkildarî qutkirina axaftina bi telefonê ya bi Ocalan re li meclisê daxuyanî da û wiha got: "Em ji vê derê ji hikûmetê, ji wezîrê edaletê, ji rayedaran dipirsin; li Îmraliyê çi diqewime? Tevî ku mafekî xwe yê qanûnî ye, çima hûn hevdîtina malbatê ya li Îmraliyê asteng dikin? Hevdîtina parêzer-muwekîlan hîmê bingehîn ê mafê parastinê ye. Hûn çima hevdîtinên wekîl-muwekîl li Girava Îmraliyê asteng dikin? Axaftina bi telefonê fikar ji holê ranekir, berevajî zêde kir. Yekane tişta ku dawî li fikarên têkildarî ewlekarî û tenduristiya birêz Ocalan bîne, hevdîtina rûbirû ya malbatê û parêzeran a bi birêz Ocalan re ye."

# Di bin zext û zordariyan de lêgerîna edaletê

Li navçeya Pirsusê ya Rihayê 3 sal berê di 14'e hezîrana 2018'an de beriya hilbijartinên 24'ê hezîranê xizmên parlamenterê AKP'ê Îbrahîm Halîl Yildiz êrîşî dikana malbata Şenyaşar kiribûn. Di êrîşê de bav Hacî Esvet Şenyaşar kurên wî Celal û Adil Şenyaşar hatibûn kuştin.

Emîne Şenyaşar û kurê wê Ferît Şenyaşar li dijî neheqî û zilmê li ber Edliyeya Rihayê dest bi çalakiya 'Nobeda Edaletê' kirin û zêdetirî 3 hefte ne li ber edliyeyê ne. Ligel ku malbat gelek caran rastî êrîşa polîsan hat û hat binçavkirin jî dîsa jî dev ji daxwaza edaletê bernadin.

Şandeya KCD, DBP û TJA'yê çûn serdana malbatê û piştgirî dan çalakiyê. Hefteya borî Dîlan Îzola ku dê, bav, amojin û zarokên wê li Siwêregê ji aliyê kur û biyarên parlamenterê berê yê AKP'ê yê Rihayê Zulfîkar Îzol ve, bi hinceta nelihevkirina li ser zeviyan hatibûn kuştin, li cihê çalakiyê serdana malbata Şenyaşar kir. Îzol bi dayik Emîne Şenyaşar re axivî û diyar kir ku qetlîamên hatine kirin wek hev in û ew destek didin nobeda 'Edaletê'.

Şandeya KCD û DBP'ê di dorpêça polîsan de serdana malbatê kir û şandeyê diyar kir ku ji bo zextên li ser malbatê zêde nebin ew bi nûnerî hatine serdanê. Emîne Şenyaşar qala tiştên hatine serê wan ji şandeyê kir û wiha got: "Dewlet li ku ye? Ji bo lawê min 150 sal ceza dixwazin. Em li vir rûdinên mudaxileyî me dikin. 17 roj in dixwazin me ji vir rakin. Bila dîmenên komkujiya li ber nexweşxaneyê derxin holê, em ê jî ji vir rabin. Heqe qeydên komkujiyê derkevin holê wê sûcdar jî derkevin holê. Hemin hûn dewlet in, qeydan derxin holê. Heke sûcê me hebe, me jî bigirin."



Emîne Şenyaşar dermanên dixwe ji çenteyê xwe derxist û nîşanî Hevseroka DBP'ê Salîha Aydenîz da û wiha got: "Ji bo ez rakevim dermana vedixwim. Çavên min ji ber niqresê berdidimê kor bûn. Êdî halê me ku em ê sebir bikin nemaye. Berî ez bimirim dixwazim Fadilê xwe bibînim."

Salîha Aydenîz dilxweşiyê li Emîne Şenyaşar kir û wiha got: "Em heta dawiyê li ba têkoşîna we ya mafdar in. Hûn li vir rûdinên, haya me ji we heye. Ji bo zextên zêdetir li ser we nakin em li vir li ba we rûnanên. Lê dilê me bi we re ye. Daxwaza we ya edaletê daxwaza me ye jî. Ev bêedaletî û dijminî nayê qebûlkirin. Ev dijminahî ye. Ne tiştekî din e."

Emîne Şenyaşar got êdî hêvî û baweriya wan bi edaletê nemaye. Li ser vê yekê Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk jî wiha got: "Ji bo her kesî helbet wê rojekê edalet were. Em heta dawiyê li ba têkoşîna we ne." ***RIHA***



## Havînê dişewitînin, zivistanê dibirin

Li Kurdistanê wêrankirin û talana xwezayê dewam dike. Demsalên havînan leşkerên ku derdikevin operasyonê agir berî daristanan didin û bi rojan şewata daristanan dewam dike. Dema gundî dixwazin şewatê vemirînin ji aliyê leşkeran ve tên rawestandin. Li aliyê din jî bi çêkirina bendavan dîrok û xweza tê tunekirin.

Çend roj berê li herêma Besta ya Şirnexê bi hezaran dar hatin birîn. Vê carê jî li gundê Oleka Jor ya Bedlîsê daristan tê tunekirin. Li devera gundê Oleka Jor a bi ser Bedlîsê ku di 19'ê kanûna 2017'an de Goristana Xerzanê lê hatibû xerakirin, bi mehan e dar tên birîn. Nahêlin kes nêzî herêmê bibe û darên tên birîn jî cerdevan wan li qamyonan bar dikin û dibin deverên din. Çend meh berê Parlamenterê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ê Bedlîsê Mahmût Celadet Gaydali, ev mijar xistibû rojeva meclisê û destnîşan kiribû ku ji xeynî herêma gundê Oleka Jor li Xîzan, Norşîn û Tetwanê jî dar tên birîn.

Ji bo tezekirinê tune dikin!

Gaydali anî ziman ku birîna daran ewilî li bejahiya gundê Gelê Axkîs ê navçeya Xîzanê dest pê kiriye û dûre li gundê Kesan ê navçeya Tetwanê jî dest pê kiriye. Gaydali, bi lêv kir ku ev mesele ji wezareta daristanê pirsiye û wezaretê jê re gotiye: "Em daran ji bo tezekirina daristanan dibirin." Gaydali da zanîn ku darên tên jêkirin bi qadî lûleyên sobeyan qalind û qevdika destan qalind in û got: "Wezareteke daristanê ya hay ji vê tune ye heye. A dikin talankirin e."

Gaydali destnîşan kir ku darberû jî kokê tên birîn da careke din şîn neyên û li Xîzanê jî ji gundiyan re gotine "daran bibirin". Gaydali diyar kir ku piştî ku gundiyan nebiriye, vê carê ji Motkiyê cerdevan birine û dar hatine birîn.

Gaydali destnîşan kir ku di serdema krîza avhewayê de dar tên birîn û got: "Fedî nakin di televîzyonan de jî dibêjin 'dar jiyan e'. Hevsengiya ekolojiyê bi temamî xirab bikin. Em li her derê bi lêv dikin. Ev çavkaniya mirovan e. Daristan, nexweşxane ye." ***BEDLÎS***

## Mezopotamya Arşîv bîrê zindî dike

Bi pêşketina cîhana dijîtal êdî jiyan li ser platformên medyaya civakî didome, ji xwarin, vexwarin, gerîn, lêgerîn, siyaset, aborî, nîqaş, perwerde û hwd bi kurtasî jiyan tev êdî li ser platformên dijîtal tê jiyîn. Malpera Mezopotamya Arşîvê bi boneya daneheva dîmen, wêne û videoyên bi salane ku ji aliyê gel ve hatine kêşan ve wan dide hev. Ev malpera ku li ser platformên dijîtal dest bi weşana xwe kirî dîmen û wêneyên ku li ser erdnigariya Mezopotamyayê hatine kêşan tên parvekirin. Dê li ser malpera xwe, YouTube, Twitter, Facebook, Instagram û Pinterestê dîmen û wêneyên ji arşîva kûr a Mezopotamyayê parve bikin. ***AMED***

## HEZKIRIN Û BÊRÎKIRINA EFRÎNÊ MIN LI SER NIGAN DIHÊLE

# Tiştek şûna dengbêjên me nagire

Rizoyê Xerzî

*Mêvanê me yê vê hejmarê hunermendekî navdar ê xwedî dengekî zêrîn e ku ji salên 85'an bi deng, stranên û bi sekn û helwesta xwe her tim di dilê gel de dijî. Me xwest, vê hejmarê hunermend Xelîl Xemgîn bikin mêvanê we û çend pirsan jê bikin da ku dilê hezkiriyên wî yên ji zû ve ye li benda wî ne xweş bibe.*

**Kengê têkiliya te û muzîkê bi hev re çêbû, tu dikarî ji kerema xwe behsa wan rojan bikî; bandora malbatê û bandora radyoya Bexda û Erîvanê û hunermendên wê demê bikî?**

Êvarê dema ku seat dibû 4 radyoya Kirmanşanê û ya Erîvanê derdiketin. Helbest û stranên radyoya Kermanşanê hê jî di guhê min de ne. Radyoya Erîvanê piştre navdar bû. Li dû wan jî radyoya Bexdayê derket. Min stranên ku di radyoya Kirmaşanê de derdiketin yek bi yek ji ber kiribûn. Seat di 4'an de rûspiyên gund li ber dara di hewşa me de, li hev kom dibûn. Ku radyoyê parazît bikira tev aciz dibûn. Bavê min bi xwe jî di dawet û şînan de stran digotin. Pir yekî dilgeş bû di vî alî de bandora wî gelek li ser min hebû.

Li herêma me dengbêjên resen hebûn. Pirî wan çûn ber dilovaniya xwe. Yê herî dawî jî Bavê Seleh bû. Zêdetir navê malbata Mala Evdê Naza di dengbêjiyê de hebû. Hê jî li ser kevneşopiya xwe ne. Ji radyoyan bêhtir, di zaroktiya xwe de aşiqê dengê Hesenê Cizîrî û Meryemxanê bûm. Ev her du deng, ji bo min pir cuda bûn.

**Tu dikarî ji kerema xwe behsa pêvajo û tevlêbûna xwe ya Koma Berxwdan bikî?**

Di sala 1984'an de şehîd Sefqan, Şehîd Mizgîn, Celal Ercan kom ava kirin. Wê demê ez hê nehatibûm Ewropayê. Yanî di avakirina Koma Berxwedan de tunebûm. Wê demê li Erebistanê wek karkerekî dixebitîm. Lê peywendiya min di sala 1978'an de bi alî wê yê rêxistinî re hebû. Ez di sala 1985'an de hatim Ewropayê. Li ser daxwaza Rêberê Gelê Kurd ez hatim vir û tev li înşakirina Koma Berxwedanê bûm. Demek dirêj e ji bo wê dixebitin. Herî zêde me di wan salan de van xebatên çandê kir ku bandor li welat, civak û vî miletî kiriye kir. Niha sazî û sazîgerî zehf in lê wan bandora xwe ji xebatên me girtiye. Min Celal Ercan nedît, ji ber ku ew vegeriyabû welat û şehîd ketibû. Ez bi Şehîd Mizgîn re heya salên 1988'an xebitîm. Ciwanên ku ji welat îltica dikirin dihatin xebatên me didîtin û tev li xebatên me yên şano, govend û koroyê dibûn. Şehîd Kasim Engîn jî endamê saziya me bû. Ne endamê Koma Berxwedan bû lê berpirsiyarê şaxê Fankfurtê bû.

**Ji derveyî xebatên te yên di Koma Berxwedan de, te gelek albûm derxistine. Bi giştî tu dikarî behsa awaz û gotinan bikî, piranî gotin ên kê ne, çawa hatine hilbijartin û awazên stranên ku te gotine piranî kê amade kirine?**

Navê albûmên ku min derxistine wiha ne: Bagok (1988), Ey Şehîd (1992), Name (1996), Zend(2004) û Ax (2008). Ji 2008'an vir ve min albûm çênekiriye. Stranên min ên di nav albûmên hevalan de di albûmên Koma Berxwedan de jî hene. Bêhtir qabiliyeteke min a hunerî heye di alî gotin, huner û çêkirina muzîkê de. Tecrûbeya ku min ji stîlên Mihemed Şêxo girtine hene, wan bandor li min kiriye. Piştre têgihiştina aliyê civakî , siyasî û felsefî jî hene. Mirov dixwaze wan biparêze, bi pêş bixe. Ji berê de ez wisa difikirim, dibêjim ku tiştek çêbikim bila tiştek baş be mayinde be, ne yê xerckirinê be. Min di sala 1976'an de straneke bi navê 'Rewşa mala' nivîsand lê heya niha min nekiriye nav albûmên xwe. Niha li ser wê strana xwe dixebitim. Têgihiştina min, hezkirina min ji edebiyatê re heye. Bi taybetî jî Seydayê Cegerxwîn diecibînim û min gelek helbestên wî ji ber kirine. Min dizanibû ku kîjan helbesta wî di kîjan dîwanê de heta di kîjan rûpelê de bû. Ji bo min şensek bû ku min seydayê Cegerxwîn di sala 1976'an de li Helebê dît. Min jê re helbesteke wî xwend û min aferinek jê girt.

Ez helbestvan nîn im lê hezkirina min tim jê re heye, ji ber vê dema ku tiştek dinivîsim hewl didim ku baş be. Min tim hewl da ku tiştek ji bo piyasê nenivîsim lê bêguman kêmasî jî hene. Min di salên 80'yî de xortekî bi navê Kesra nas kir. Naskirina wî salek dewam kir û ew bi qezayekê jiyan xwe ji dest da. Bandora helbestên wî gelek li ser min çêbû. Min dema ku helbestên wî xortî xwendin, min got li ser klasîkên me tiştên nû tên çêkirin.

Bi nasîna wî min dît ku çawa mirov dikare helbesta bike stran. Ez piştre tim li kesek wisa geriyam paşê min Hekîm Sefqan nas kir. Belkî we jî ferq kiribe piraniya gotinên stranên min jê yên Hekîm Sefqan in. Ji sala 1990'î ve em bi hev re ne. Em bi hev re dixebitin, kar dikin jiyana me têkiliyên me tim di nav hev de ne. Hekîm ji bo min cuda ye. Ew

Ev du sal in ez di medyaya civakî de jî dişopînim, ji bo yên ku stranan dibêjin ne muhîm e ku çiqas bandor li kesan dike, ji bo wan ya muhîm ew e ku çiqas belav bibe. Ku mirov bikeve xemên wisa, wê çawa stranên bi tam derkevin

dizane ez çi dixwazim di straneke de, di muzîkekî de çi derbas dibe ez jî bi wî dizanim.

Tiştek ku li dewsa klasîkên me û dengbêjên me bigire tune. Di awazên ku min çêkirine de jî gelek kêmasî hene. Lê tişta herî kambax û xerab a ku min diêşîne ew e ku min stranên gelêrî digirtin û peyvên wan diguhertin. Ev hem rexne ye hem jî rexnedayîn e. Poşmaniya min ya herî mezin ev e dibêjim ku xwezî min tiştek wisa nekira.

**Tu kengî ji welat derketî, çend sal in tu li xerîbiyê dijî û bêrîkirina welat bandoreke çawa li te dike, herî zêde tu bêriya çi dikî? Gava welat an jî Efrîn tê gotin pêşî çi tê bîra te?**

Ez di dawiya sala 1985'an de ji welat derketim. Dema ku ez ji Efrînê derketim, di sala 1985'an de min li çiyayên Efrînê nêrî û got ku ez ê li we vegerim lê hewce ye dema ku ez hatim hûn jî min bibînin. Piştî 28 salan cara yekem bi saya Şoreşa Rojava di sala 2012'an de çûm Efrînê. 16 seatan li wir mam em di nav agir de çûn û hatin. Dê û bavên min hêj sax bûn min ew dîtin. Ez, Hekîm Sefqan û Bengî Agirî bi hev re bûn. Bîranînên wan jî hene, dema ku em gihiştin herêmê min li wan çiyayan nêrî bi wan re axivîm û giriyam. Dema ku ez giriyam, ew jî bi min re giriyan. Niha jî dema ku behsa wê kêliyê dikim hestiyar dibim. Ez ji ber çi bêriya Efrînê dikim? Tim dibêjim li vê derê roj ji cihekî derdikeve li gundê min ji cihek din derdiket. Ya vir û ya wir ne wek hev in berovajî ne. Ku ez heya niha karibûm li ser nigên xwe bisekinim, stranan binivîsim û bêjim, tev ji hezkirin û bêrîkirina wê ye.

**Çima tam û çêj û qalîteya stranên berê bêtir hebû? gelo qalîteya stranan ketiye an jî sedemeke din heye ku ew tam û çêja berê di stranan de nemaye?**

Ev pirs tam li gorî min e. Stranên me çiqas diçin qirêj dibin, tenê stran jî nîn in. Li gorî min di vê serdemê de erozyon, çolbûna mêjiyê mirovan heye. Yanî wek erozyona ku di xwezayê de çêdibe. Bi pêşketina teknolojiyê, sivikiya jiyanê em dikarin xwe biparêzin. Em dixwazin çandekê ava bikin, çanda ku di nav



çar welatan de belav bûye û her çar welat jî dixwazin wê çandê tune bikin. Ji bo parastina çandê hewce ye ku em wek dewletê tevbigerin, lê derfet tune ne. Ji alî din ve, ev erozyona ku bi ser civakan ketiye ji her kesî bêhtir bandor li me dike û me li ber pêlên xwe difirîne. Ji tama stranê bêhtir her ku diçe karekterê hunermed jî diguhere. Ev guhertin jî tesîr li stranan dike ji ber yê ku stranê çêdike hunermend e. Ku dilê te bi evînek neşewite bi evînek neêşê nepijê, tu yê çiqas dikaribî li ser wê evînê stranek binivîsî û ew ê çiqas bibandor be? Yanî her diçe karekterê hunermend dirizê, karekterê hunermend tune dibe. Li ser huner û hunermendiyê razemeniyek jî tune ye. Ev jî dihêle ku hemû tişt bi bazarî, ji armancê bêhtir li ser popûlîzmê were çêkirin.

Ev du salên ez li medyaya civakî jî dişopînim ji bo yên ku stranan dibêjin ne muhîm e ku çiqas bandor li kesan dike, ji bo wan ya muhîm ew e ku çiqas belav bibe. Ku mirov bikeve xemên wisa wê çawa stranên bi tam derkevin. Stranên me her diçe dirizin. Hewce ye ku mirov li sedema vê bigere.

**Kurd herî zêde ji stran û kilaman hez dikin û têkiliyeke xurt a bi dengbêjiyê re heye. Di vê serdemê de tu rewşa muzîka kurdî çawa dinirxînî?**


Di aliyê dengbêjiyê ve, mixabin her diçe, di nav nifşên niha de gelekî kêm dibe û ew dibe tenê wekî arşîva civakê. Heke ew arşîv baş were parastin, wekî çawa ku klasîkên Ewropayê hatine parastin û niha li akedemiyan wekî ders tên dayîn, dê yên me jî wiha bibin.

Lê ev mixabiniyeke mezin e ku em di aliyê arşîvê de kêm in. Ji aliyekî din ve ez difikirim ku ev nifşa niha ya dawî ye ji bo dengbêjiyê .

Rewşa çand û mûzîka kurdî jî dikare di vê çarçoveyê were nirxandin. Divê ku berê razemeniyek ji bo tedbîrên xweparastinê hebûna, girîng e ku qedrê hunerê di astekê de bê parastin. Ev razemenî jî pêşengiyê ji civakê re dike. Gelek caran min gotiye û rexne li siyasetê jî kiriye ku li ser vê yekê razemeniyek nehatiye kirin. Ev yek bi giştî ye û her çar beşên Kurdistanê jî wiha ne. Ji bo me tevan tevgera azadiyê wekî hêviyekê bû ji ber ku bi şêwazeke hemdemî ye lê ji bo hunerê mixabin razemeniyek nehatiye kirin. Lewre niha jî em bedelên wê yekê didin. Niha muzîka kurdî li bin guhê hev ketiye. Rast e dengê gelekî xweş hene, hin tiştên gelekî xweş tên çêkirin mirov van înkar neke, lê dema ku mirov rast binirxîne, muzîka kurdî nasnameyek wê heye û vejînek wê jî heye lê bi rengekî zanist xwedîderketinek ji bo parastina ji bo siberojê tune ye.

Li vê derê bayê postmodernîzmê bandora xwe li her tiştî dike. Muzîka kurdî wiha bûye ku êdî lêgerînên tiştên nû, tiştên bibandor, tiştên ku civak bêje ez va me, binêre ev nasnameya min e, tune ye.


Divê ku bazareke kurdan ya bi rêk û pêk hebûya û wiha neketina destê her keseî. Bîr û hafizeya civakê gelekî girîng e û pêwîst bû ku ji zû de razemeniya vî tiştî bihata çêkirin.



## Xelîl Xemgîn kî ye?

Hunermend Xelîl Xemgîn di sala 1957'an de li gundê Çeqela Jêrîn yê navçeya Şiya ya Efrînê hatiye dinyayê. Ji bilî xebatên wî yên di nav Koma Berxwedan de, albûmên wî yên bi navên Bagok (1988), Ey Şehîd (1992), Name (1996), Zend (2004) û Ax (2008) hatine weşandin. Di sala 1985'an de ji welat derketiye û berê xwe daye Ewropayê. Ji sala 2008'an û vir ve tu albûmên nû dernexistine û çavê hezkiriyên dengê wî her li rê ye.

# Destana neteweyekê





Kenan Colemêrgî

... û Ferx li Bozeşînê siwar bû, ber bi geliyekî bêdawî ve, bi Bozeşînê re bi rê ket. Di wî geliyê kûr û bêdûmahîk de, ji bilî wî û Bozeşînê kesek din tune bû; ber bi eşqa abadînî ve diçû.

Pênc sal beriya niha, em bûn gerîdokên kuncên welêt. Gelek deman min bi xwe du sê şevan xew nedikir. Ji wan deman demekê rêka me ber bi Qilebanê ket.

Qileban ji bo çanda devkî behrek bû, ez heta wê demê hêj baş aşînayê vê qadê nebûbûm lê belê gelek hevalên ji vê gencîneyê xebatên jêhatî kirî hebûn. Em bûn mêvanên malbatekê, heta derengiya şevê me suhbetên cur bi cur kirin. Diviya me ev suhbet û yekeyên çanda devkî tomar kiriba, me jî wisa kir û em hatin dema qeydên xwe, piştî suhbeta xweş û çê, dengbêj qala destanekê kir.

"Ev destana malbata me ye, ji me pê ve hemû kes şaş dibêjin, gelek kevn e, ev çîroka Ferx û Sitiyê ye, lê hişyar bin, guh li bin!"

Bi rastî jî ev rewş di nav Kurdistanê de hebû. Hinek malbat û malbatên dengbêjan, bi taybetî destanek an jî serpêhatiyek girîng digel nifşên xwe vediguhastin. Ev malbat jî ji wan malbatan bû.

Dengbêj dest bi destanê kiriye, hêdî hêdî guhên xwe bel dikim, ji ber ku tiştek cuda heye, ne wek destanên em dizanin e, ne wek ew destanên eşqê ye, çîrok weke wan naherike. Ew destanên me ji pirtûkan dîtî û bihîstî, ew destanên hatine nivîsîn, ew destanên neteweyan, hêmanên bingehîn ên mirovahiyê, ew destanên şaristaniyên kevn ên ku digotin "destanên ewilî yên cîhanê"...

Tijî metafor û mîtos, ev hemû tişt pêkre ji devê dengbêjî yek bi yek dirijtin. Dengbêj hay jê nebû ku ka çi mîtosên girîng bi peyvên xwe vediguhêzîne. Wî bi amûra xwe an ku bi bîra xwe çîrokeke beriya dîrokê derbasî sedsala bîst û yekemîn dikir.

Wî vedigot me guhdarî dikir. Me ew mîtos ne ji tabletên Somerî û Babîliyan dixwend, me ji dengbêjek kurd guhdarî dikir.

Belê, armanca min a ji vê nivîsê jî ev e; dixwazim dest bi vê destanê û van metaforan bikim û bi qasî ku min bihîstî û têgehiştî qala wan bikim û digel destanên cîhanê yên nivîskî berawird bikim.

Helbet niha nikarim destana Ferx û Sitiyê tewaw bikim û hemû metafor û mîtosên destanê li vê derê deynim lê belê yên girîng û mînakên wan ên dinyayê niha ez ê deynim beranberê hevdu û berdim ber nîqaş û şîroveyên we.

**Kî ye Ferx, Sitî kî ye?**

Beriya hemû tiştan, divê em pirsê bikin û werin guhdariya dengbêjî bikin, ew dê bersiva me bide. Min kir ku gotinên dengbêjî kurt bikim ku li ser xalên girîng baştir bisekinin. Dengbêj;

***"... Du bira hebûne (Serdar-Serkan), mîrên erdên xwe bûne.***

***Her çi kiribin bêbiçûk mane.***

***Ji bêbiçûkiyê dikevin xeman digel hevjînên xwe, ji xwedê re qurbanan didin ku zarokên wan çêbin, diçin çiyayê Xumaroyê, pezek kovî dixin dafê,***

***zeft dikin dikin qurbanî bo jînê, jin dibêjin riho bikeve zikê me. Mêr dibêjin tovo bikeve ji asîmanan.***

***...Derwêşek tê, guh li dengê wan dibe. Dibêje bira û jinbirayan, eve sêv e, sêva rihan e, her nîvek bo dilan e, hûn bixwin, heke rih kete malzarokan. Nîvek kur e ew Ferx e, nîva din keç e ew Sitî ye,***

***Dê bigehine êkûdu ye!"***

Dê haydê em dest bi şîrove û nirxandinên vê destana cîhanê bikin. Fermo.

**Destpêka Jiyanê!**
**Ramayana kengî bû Ferx?**

Li gorî bendên dengbêjî, dengbêj tiştekê ji me re disalixîne, ev her du bira xwedan û xweyiyên erd û welatekî ne. (dixwazim hûn vê xweyitiyê weke "cîhanê" bifikirin)

Lê belê bêzar in û bi vê rewşê kêfnexweş in, jiyanekê dixwazin. An ku weke destpêka cîhanê, cîhan (erd, welat) heye lê belê hêj jiyan li ser ava nebûye. Weke em jî dizanin beriya her tiştî jiyan nebû, tenê cîhaneke reperût hebû.

Dayik û bavên Ferx û Sitiyê, ji bo jiyanê tovekê ji asîmanan dixwazin û ku rih bikeve term û laşê mirovan. Heke rih ket ev destpêka jiyanê ye. Dê jiyanek, he-şîn bibe, he-jîn bibe.

Li vê derê, weke destana hindûyan a bi navê Ramayana her tişt bi xemekê dest pê dike, xema "tov şîn nabe û rih nade" ye. Ev gotin di nav destana Ramayana de derbas dibe û gelek caran tê dubarekirin. "Tov şîn nabe, rih nade"

Ku tov şîn be û rih bide xwînê didin, di destana Ramayanayê de hespekî qurban dikin. Weke li jor me ji devê dengbêjî bihîstî ji bo rihê Ferx û Sitiyê bide pezeke kovî qurban didin.

Di hemû pirtûkên olan û nivîsên kevnare de vê tiştê dibêjin, di wan çîrokên mirovahiyê de, yên mirovan dixwest ji cîhan û jiyanê fêm bikin, ev yeke dihat gotin; ji asîmanan tov ket, paşê rih kete mirovan. Di baweriya êzdayetiyê de jî ev tê gotin; tovê Adem ket di nav dîskekê de horiyên asîmanan ew hilgirtin û dûnde û nifşa êzidiyan ji vê derê dest pê kir.

Em niha vegerin ser bendên dengbêjî, weke hûn jî dibînin, hemû tişt bi sêvekê dest pê dike, li gorî gelek ol û baweriyan, destpêka çîroka mirovahiyê û mirovbûnê ye ev yek.

Sêv (evînî) kir ku mirov xwe nas bike, li gorî olan, Hawa û Adem piştî hevdu nas kirin an ku piştî sêv xwarin ketine ser rûyê erdê. Heta hingê xwedayî bûn lê bi sêv xwarinê hay ji hest û taybetiyên zayenda xwe hatin, taybetiyên xwedayî jê hatin hilgirtin.

Bûne mirov, bûne xwedî hest, bûne xwedî merg û mirinê. Çîroka mirovan ev e, ji dayik dibin, digel hest, bawerî û zayendên xwe dijîn û dimirin.

Di Ramayanayê de dibêjin ku Mîr Rama rihê "xweda Vîşnu" di bedena xwe de digerîne. Kevana "xweda Şîva" dikêşe û dişkêne. Ku xwesteka mîrê mezin jî ev e ku kesek heke kevana "xweda Şîva" bikaribe bikêşe dê keça xwe ya bi navê "Sîta" lê mahr bike. Lê belê jinbava "Sîta" vê sozê xirab dike, Mîr Rama û Sîtayê mişextî dike. Dikevine rewitiyeke dirêj a 14 salan, dawiya dawî Rama û Sîta digehine hevdu.

Taybetiyên xwedayî li cem Ferx jî heye, Ferx hêj di qûndaxê de diaxive, digel ajalan hevaltiyê dike, nifiran dike û ev nifir pêk tên. An ku Ferx jî li gorî şîroveyên destana Ramayanayê di nav xwe de rihê xwedayekê digerîne. Ferx jî ji ber jinmama xwe mişextî dibe û piştî salan digehe Sitiyê.

**Hawa ye an Sitî ye, Ferx e an Adem e?**

***"...Piştî dayik û bavên Ferx û Sitiyê, wan sêvan dixwin rih dikeve malzarokan, zarên wan ji dayik dibin, yek dibe Ferx a din jî dibe Sitî."***

Navên qehremanên destanê jî gelek balkêş in. Wateya Sitiyê jin e, weke ku olan navê jinê di çîroka jiyanê de kiribin Hawa, em dikarin niha Hawayê weke Sitiyê bifikirin. Wateya Ferx jî kur e, kurê biçûk e, Adem e. Gelek deveran navê destanê bi vî awayê tînin "Ferxê Sitî". Ferxê ku ji Sitiyê bûyî.

Ji vir xuya dibe ku qala Ademê ku ji Hawayê bûyî dike, yan jî bi peyvên zanistiyê ve bêjin; nêrê ku ji mêyê bûyî. Weke baweriyên kurdan, di çîroka mirovên ewilî de nêr ji mê dibe an ku Adem ji Hawayê dibe, Ferx ji Sitiyê. Dikarin gelek şîroveyên etîmolojîk û mîtolojîk lê bikin lê belê hem bila mijara me belav nebe hem jî niha xwe bi vê ve newestînin.

**Bi mirinekê, jiyanek dest pê dike?**

Dengbêj; ***"Dema Ferx heft rojî, bavê Ferx dimire, bavê Sitiyê an ku mamê Ferx, dixwaze her Ferx û Sitiyê pekrê xwedan bike, weke xwişk û birayên êkûdu.***

***... Rojekê dayika Sitiyê diçe ku şîr bide Sitiyê, dibîne ku destê Ferx bi destê Sitiyê hatiye girêdan û di heman landikê de ne"***

Weke ku hûn dibînin, qala heft rojan heye, piştî heft rojan tiştek diqede û tişteke nû dest pê dike. Di dîroka mirovahiyê de û di nav gelek nivîsên şaristaniyan û pirtûkên olî de dibêje dinya di nav heft rojan de ava bûye. Mirina dayik û bavên Ferx dibe sedema destpêka çîrokekê. Ji ber vê yekê Ferx û Sitî dikevine nav landikekê û destên wan bi hev re tên girêdan. Xilasiyek digel xwe destpêkekê tîne.

Bi mirina bavê Ferx nîşaneya avabûna dinyayê dide û jiyanek dest pê dike, jiyana zîndeweran jiyana mirovahiyê û çîroka Hawa û Ademî, çîroka Ferx û Sitiyê dest pê dike. Li gorî ol û baweriyên mirovan, her çawa dinya di heft rojan de ava bibe û piştî heft rojan jiyana ser rûwê erdî dest pê kiribe, çîroka me jî bi van hêmanan dest pê dike û berdewam dike.

**Kîtharona Oedupisî bilind e an Tewilxaneya Ferxî Fireh e?**

Dengbêj; ***"...Tê xewna bavê Sitiyê; Ferx dema mezin bû, dê aşiqê Sitiya keça te bibe, ew Sitî ye ya ku tu weke xwişka wî mezin dikî, ew Sitî ye ku di landika Ferxî de hişyar dibe, Ferx dê bibe sedema we û aşiqê keça te...***

***Bavê Sitiyê dema hişyar dibe, ditirse, diçe û Ferxî ji landikê derdixe û dibe di nav tewilxaneya hespan de, daxwaza kuştina Ferxî dike ku hesp pêlê bikin û bikujin. Ku êdî ev tirsa xewna wî biqede. Ferxî dihêle di nav tewilxaneyê û derdikeve.***

***Di nav hespan de hespek bozeşîn heye, Ferx ziman dikeve û digel Bozeşînê diaxive.***

***Ferxo bang dike; delê hespê mino Bozeşîn e. Têne têne min sipehî ne û heke Ferxikê malikwêran lê siwar be***

***Dê te biket emergozî ne***

***Bozeşîn;***

***Hespê bozeşîn çi kiriye***

***Hatiye ser serê Ferxo***

***Lê sekiniye***

***Heta sipêdêyan***

***Lê nobe ye.***

***Heta sipêdê Bozeşîn derdorên Ferxê biçûk dibeze, nahêle çi hesp nêzîk bibinê û bikujin."***

Bendên jorîn du destanên cuda yên yewnanan tîne bîra mirovî; a yekemîn çîroka Oedipusî ye. Bi kurtasî ev çîrok wiha ye; rojekê bavê Oedipusî di xewna xwe de dibîne ku dê rojekê kurekî wan ji dayik bibe, ew kur dê bavê xwe bikuje û dê digel dayika xwe bizewice. Dema vê agahiyê ji xewna xwe digire, Oedipusî didin destê xulaman dibêjin bibin serê çiyayê Kîtharonê bila li wir ajal bixwin û bikujin. Dema ev xulam Oedipusî dibe serê çiyê, dilê wî bi zarokî dimîne, zarokî dide malbateke bêzarok, ji vir şûnde Oedipus jî weke Ferxî ji mirinê difilite...

Oedipus li cem wê malbatê mezin dibe, hizra Oedipusî ew malbata wî ye.

Piştî demekê heman xewna bavê wî dîtî tê xewna wî jî. Hizir dike ku yên ew mezin kirî, dayik û bavên wî ne. Ku tiştek wiha pêk neyê ji wir, ji mala xwe dûr dikeve. Bi kurtasî; paşê bi awayekî rastî bavê xwe yê rastî tê û şerek diqewime. Helbet nizane ku ew bavê wî yê rastî/ilaha ye. Ew dikuje. Paşê jî heman tiştên xewnê pêk tên, bêhaya xwe digel jina mêrikê kuştî an ku bi dayika xwe re dizewice û hwd.

Dengbêj;

***" ...Bi roj, dema mamê Ferx tê tewilxaneyê, dibîne ku li derdora Ferx Bozeşînek digere, dilê wî dimîne, dibêje; jixwe zarok e, dê çi guneha zarokekê hebe, hesp jî hay jê hatiye û parastiye, ez jî dê biparêzim."***

Di navbera her du çîrokan de bûyer weke hev diherikin, weke ku mamê Ferx xewnekê dibîne û biryarê distîne ku Ferx bikuje dibe di nav tewilxaneyê de ku ji hêla ajalan ve bê kuştin. Mamê Ferxî dilê xwe bi Ferxî dihêle, bi ser hişê xwe û hestên xwe ve tê, ji kuştina wî vedigere. Li tewilxaneya hespan bi hestên mirovî jiyaneke nû dide Ferxî.

Heman tişt bi serê bavê Oedipusî jî tê û dike. Xewnekê dibîne û biryarê distîne ku Oedipusî bikuje dide xulaman dixwaze bibin serê çiyayê Kîtharonê ku ji hêla ajalan ve bê kuştin. Xulam dilê xwe bi Oedipusî dihêle, bi ser hişê û hestên xwe ve tê, ji kuştina wî vedigere. Li çiyayê Kîtharonê bi hestên mirovî jiyaneke nû dide Oedipusî.

Her du destan tiştek wiha nîşanê me didin. Hemû mirov xwedî hest in û her çend bizanibin tiştek dê bibe sedema kuştina wan jî li dûv hestên xwe diçin, ji ber ku hest in mirovekê heyî dikin û ramanan ava dikin. Êdî jiyanek bi hest û ramanan dest pê dike.

**Avakirina tabûya însestê**

Di navbera her du destanan de divêt mijareke din jî bê berawirdkirin; armanca avakirina tabûya însestê...

Yek tirsa zewaca xwişk û birayî (Ferx û Sitî) a duyê jî tirsa zewaca dayik û kurî (Oedipus); ev însest e.

Li gorî nivîsên demên antîk û dînî, mirov bi însestê belaveyê dinyayê bû, li ser cîhanê tenê carekê însest pêk hat careke din divêt nebe. Ji bilî vê însest qedexe ye û tabû ye. Bi van çîrokan daxwaza avakirina vê tabûyê heye û tirsa vê bûne nîşanê me jî didin.

**Bukefalosa Îskender, Bozeşîna Ferx!**

Weke di dîrokê de jî dihê behskirin; bazirganên welatê Îskenderî, ji bo firotinê ji welatekê dûr hespek bi navê Bukefalos tînin. Dema dê bê firotin kesek nikare vî hespî vepesirîne. Îskender wê çaxê hêj biçûkek sêzdeh salî ye. Tê û hespî vedipesirîne, digel diaxive. Bukefalos û Îskender êdî ji hevdu venabin. Îskenderê Mezin li ser pişta Bukefalosê rewitiya cîhanê û abadiniyê dike.

Belê, Ferx jî dê wiha bike... Weke ji bîra dengbêjî de dirêje; di tewilxaneyê de hespê herî zêde qirêj bûyî û hespê ku kesek çi pûke pê neke, Bozeşîn e. Ferx hêj biçûk, hêj di nav qûnpêçkê de digel Bozeşînê diaxive û ew Bozeşîna ku kesek lê xwedî dernakeve, dema Ferx dibe sêzdeh salî xwedan dike. Êdî Bozeşîn û Ferx ji hevdu venabin. Ferxê biçûk li ser pişta Bozeşînê li cîhana xwe digere diçe rêkên çûyîn û nehatinê, ber bi abadiniyê ve diçe.

Helbet me hêj destpêka destana Sitî û Ferxî neqedandiye. Hêj dê Ferx mezin bibe, dê aşiqê Sitiyê bibe, mamê wî dê bixwaze bikuje, dê bibe rêwî û gelek bûyeran bijî, paşê dê xalên xwe peyda bike û biçe "rêka çûnûnehatinê". Dawiya vê rêkê dê bi ser bikeve û xwe bigihîne xweyiya qesra kuloxên Gulê. Paşê veger û mirina (destpêka jiyanê) Ferx û Sitiyê.

Ne Adem û Hawa, ne Ramayana, ne Oedipus, ne jî Îskender, yek ji van jî têra Ferx û Sitiyê nîn e. Her yek ji van destanan beşek biçûk e ji destana me. Ev hêj destpêk e.

Di beşeke din de, dê qala Gilgamêş û Ferx û Sitiyê bikim, dê hewl bidim ku van her du destanan berawird bikim.

**Ji bo beşa tê gotinek; heke bixwazî nemir bî, divê bimirî!...**

# Ji bo berjewendiyên xwe şer dirêj dikin

Navenda Nûçeyan

## Dewleta tirk ji 17'ê adarê ve bênavber êrîşî Eyn Îsayê dike. Têkildarî mijarê endamên Nivîsgeha Jinan a MSD'ê gotin ku hêzên navneteweyî ji bo berjewendiyên xwe şer dirêj dikin

Piştî êrîşên Tirkiye û hêzên girêdayî wê yên li ser bajarên Serêkaniyê û Girê Spî dewleta tirk û Rûsya di 22'yê cotmeha 2019'an de li bajarê Soçiyê peymanek ji bo agirbestê di navbera HSD û dewleta tirk de îmze kiribûn. Roja ku peyman hat îmzekirin jî her carê Tirkiyeyê peyman bi dehan caran binpê kir û her çû êrîş dijwartir kirin. Rojane herêmê bi top, moşek û balafirên bêpîlot bombebaran dikin. Lê bi tu awayî heta niha ne ji Rûsyaya garantor ne jî ji hêzên nevneteweyî li hember êrîşên dewleta tirk dengê xwe dernexistine.

Bi vê bêdengiya hêzên navneteweyî her diçe Tirkiye êrîşên xwe zêdetir dike. Tirkiye ji 17'ê adarê ve bênavber êrîşî navçeyên Eyn Îsayê û gundewarên wê dike, sivîlan dike hedef û heta niha gelek kes ji ber van êrîşan hatine kuştin û gelek ji wan jî birîndar bûne.

Têkildarî mijarê, endamên Nivîsgeha Jinan a Meclisa Sûriyeya Demokratîk (MSD) a navçeya Şedadê ya Kantona Hesekê Ebîr Salih û Intîsar Hesen axivîn.

### Ji bo xwe şer dirêj dikin

Endama nivîsgehê Ebîr Salih der barê bêdengiya hêzên navneteweyî de wiha got: "Geşedan û nakokiyên dewletên derve li ser qada Sûriyeyê diyar dike ku ev dewlet dixwazin temenê aloziya li Sûriyeyê ji bo berjewendiyên xwe dirêj bikin. Hevkariya dewletên garantor bi dewleta tirk re dihêle ku sûcên xwe li Eyn Îsa û bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê zêdetir bike."

### Zextê li ser Rêveberiya Xweser

Salih destnîşan kir ku çareseriya herî guncav ji bo gel û pêkhateyên herêmê Rêveberiya Xweser e û wiha domand: "Rêveberiya Xweser li gor xwestekên gel heta niha tim tevgeriya. Armanca êrîşên dewleta tirk jî ew e ku zextên xwe li ser Rêveberiya Xweser zêdetir bikin, ewlehî û aramiya herêmê xirab bikin. Tirsê di nav şêniyan de ava bikin û guhertina demografî li herêmê pêk bînin."

Endama MSD'ê Intisar Hesen jî destnîşan kir ku dewleta tirk komkujî li dijî şêniyên herêmên dagirkirî pêk anîn û wiha got: "Tirkiye bi armanca ku şêniyan nêçarî koçber bikin û weke Efrîn, Serêkaniyê û Girê Sipî bikin. Ji ber vê yekê jî dewleta tirk bi hemû hêza xwe dixebite da ku tevliheviyê di navbera pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de derxe."

Her wiha Hesen destnîşan kir ku tişta li Sûriyeyê pêk tê lîstokek e di navbera dewlet û aliyên dijber de û wiha bi dawî kir: "Bêdengiya navneteweyî tê wateya hevkariya aşkera ya bi dewleta tirk re."



# Xetereya li kampa Roj û Holê

Navenda Nûçeyan

Ev demeke ku hêzên navneteweyî qala metirsiya DAIŞ'ê ya ku xwe ji nû ve birêxistin dike, fikarên xwe tînin ziman. Lê helbet li hember vê metirsiyê jî heta niha tu gavek jî neavêtine û tenê daxuyaniyên wek 'em fikar in' bi raya giştî re parve dikin. Li gorî daneyên rêveberiya kampa Holê niha li kampê 60 hezar û 351 kes hene.

Ev kampên girtiyên çeteyên DAIŞ'ê mîna Holê û Rojê di sibata 2019'an de bi pêngava Bagera Cizîrê ya ku HSD'ê ji bo rizgarkirina bajarokê Baxozê dabû destpêkirin ku devera herî dawî ya di destê DAIŞ'ê de bû, ji bo malbatên DAIŞ'ê hatibûn avakirin. Bi taybetî kampa Holê xeteriyeke mezin e û li gel şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê metirsiyan çêdike. Civaka navneteweyî li ser darizandina wan girtiyan bêdeng e û welatiyên xwe yên ku tev li DAIŞ'ê bûne, venagerirîn.

### Hejmara kesên li kampan

Li gor agahiyên ku ji herêmên tên parvekirin, ji dema ku malbatên çeteyên DAIŞ'ê li kampa Holê bi cih bûne zêdetirî 73 penaberên iraqî û koçberên Sûriyeyê hatine qetilkirin. Li gel vê yekê jî êrîşên bi kêr û şewitandina kampan çêdibin.

Li gorî daneya dawî ya rêveberiya kampa Holê, niha li kampê 60 hezar û 351 kes hene ku di nav 16 hezar û 404 malbatan de; hejmara iraqiyan 30 hezar û 738 kes e û li nav 8 hezar û 256 malbatan belav in. Hejmara sûriyeyiyan 21 hezar û 58 kes e û li nav 5 hezar û 619 malbatan belav in. Hejmara malbatên DAIŞ'î yên biyanî 8 hezar û 555 zarok û jin in û li 2 hezar û 529 malbatan belav in.

### Kiryarên qetilkirin û revê

Têkildarî mijarê Şêxê Eşîra Xewatina ya li navçeya Holê, Besman Nayif Hemûd axivî û wiha got: "Vê dawiyê kiryarên qetilkirin û reva ji kampê zêde bûne. Ji vê yekê diyar dibe ku DAIŞ û malbatên wan xwe ji nû ve bi rêxistin dikin. Ev yek jî xeteriyeke mezin li ser şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û dewletên cîran çêdike."

### Bi hezaran malbatên DAIŞ'î

Hemûd têkildarî kampa Holê ev agahî parve kirin: "Em li vê herêmê ne ji ber vê kampa xeter em gelekî bi tirs in ku li gel penaberên iraqî bi hezaran malbatên DAIŞ'iyên terorîst hene. Dîsa jî metirsî ji revandina wan malbatan heye ku dibe bandoreke neyînî bike û ewlehiya herêmên me xirab bike."

### Xetereya li kampa Holê

Girêdayî mijarê rûspiyê eşîra Xewatina, şêx Îbrahîm Mihemed Mihemed da zanîn ku kampa Holê 35 kîlometre dikeve rojhilatê Hesekê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, ev kamp di radeya yekemîn de beriya herêmên dîtir, xeteriyê li ser navçeya Holê çêdike û wiha got: "Ji ber vê kampê û pêşeroja wê metirsiyên me yên mezin hene. Ji ber ku ev kamp li kêleka navçeya Holê ye û rojane kiryarên qetilkirin, îşkencekirin, şewitandina konan û reva malbatan ber bi beyara herêma Hol û gundewarên wê ve çêdibin."

### Di kampan de rêxistin heye

Di berdewamê de Şêx Mihemed destnîşan kir ku nêzî 60 hezarî kes li kampê hene û Hêzên Ewlekariya Hundirîn nikarin her endamekî xwe li ber konekî deyne û wiha domand: "Di kampê de rêxistineke xurt heye, ev yek jî her roj ji ber belavbûna fikra tundraw li tevahî kampê, zêde dibe."

### Banga ji bo parastinê

Di gel bêdengiya navneteweyî ya wergirtina welatiyên xwe yên ji malbatên DAIŞ'ê û zêdebûna xeteriya kampê, şêxê eşîra Xewatine Besman Hemûd bang li HSD û Hêzên Ewlekariya Hundirîn kir ku pêwîstî bi tedbîrên ewlehî yên xurt û operasyonên ewlehî yên berfireh hene da ku ji nû ve ewlehiya kampan were dîsîplînekirin.



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Li Şengalê hewildanên fermana siyasî

Di 3'yê tebaxa sala 2014'an de pêşmergeyên PDK'ê bêyî ku guleyekê biteqînin ji Şengalê derketin, ango reviyan. Wan xelkê Şengalê di nav lepên çeteyên DAIŞ'ê de hiştin. Di encama vê êrişa hovane de bi hezaran kes hatin kuştin, bi sedan kes hatin revandin û hejmarek mezin a gel ji cih û warê xwe bûn.

Lewma ji wê rojê vir ve civaka ezîdî dibêje, "PDK'ê Şengal radestî DAIŞ'ê kir."

Tevî van hemû êş û azarên hatin jiyîn jî gelê êzidî di xwe de hêza jinûveavakirina Şengalê dît. Bi taybetî di pêşengiya Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê de, hêzên xwe parastinê yên mîna Yekîneyên Berxwedana Şengalê (YBŞ) û Yekîneyên Jinên Şengalê (YJŞ) hatin avakirin. Di rizgarkirina Şengalê de ev hêzên xweparastina civaka êzidî xwedî roleke sereke û diyarker bûn.

Bi rizgarkirina Şengal û gundewarên wê ve, civaka êzidî ji bo careke din bi fermanan re rûbirû nemîne girîngî da hêzên xweparastinê. Di vê çarçoveyê de ji derveyî YBŞ û YJŞ'ê hêzên Asayîşa Êzidxanê jî hatin avakirin ku erka wê hêzê di nav bajar û bajarokên Şengalê de parastina gel bû.

Ev ji bo civaka êzidî şoreşek bû. Cara yekem bi îradeya xwe ya azad xwe birêxistin dikin û ji bo li herêmê hebûna xwe bidomînin, xwedî li çand û dîroka xwe derkevin, gaveke wisa pîroz avêtibûn.

Bêguman bi rizgarbûna Şengalê re li gel avakirina yekîneyên leşkerî, êzidiyên Şengalê di warê civakî de jî xwe bi rêxistin kirin. Ev ji bo xelkê herêmê şoreşek bû. Lewma ji heft salî heya heftê saliyan her yek li dora vê şoreşa pîroz li hev civiya û lê xwedî derket.

Bi parastin û xwebirêvebirina xwe ve, tevî hemû tehdîdên li ser herêmê bi pêş diketin jî civaka êzidî ji bo xwe îradeya jiyana azad û aram dabû avakirin.

Lê ev nedihat wateya lîstik û planên li ser Şengalê tên lîstin bi dawî bûne. Bi taybetî bi pêşengiya dewleta tirk a dagirker re her tim Şengal bû hedafa êrişan. Di encama êrişên hewayî yên artêşa tirk de gelek şervanên YBŞ û YJŞ û welatiyên sivîl jiyana xwe ji dest dan.

Ji derveyî êrişkariya leşkerî, di qada siyasî de jî li ser Şengalê her çû zextên siyasî zêdebûn. Di 9'ê cotmeha 2020'î de bi destwerdana dewleta tirk ve di navbera rêvebiriya PDK'ê û hukûmeta Kazimî de li ser Şengalê peymanek hat îmzekirin.

Hemû pêkhatiyên li dijî vê peymana bêyom ya ku bi her awayî îradeya gelê herêmê binpê dike, nerazîbûn nîşan dan. Ji bo dengê xwe bigihînin aliyên peywendîdar, xelkê herêmê di pêşengiya meclis û saziyên Şengalê de ji 2'yê kanûna 2020'î vir ve li pêşiya avahiya Asayîşa Êzdîxanê kon vedane û dest bi çalakiyê kirine.

Piştî îmzekirina peymana înkarê, artêşa Iraqê hêzek mezin ber bi Şengalê ve şand. Ji bo beltakirina peymanê û sekinandina sewqiyata hêza leşkerî ya ber bi herêmê ve şandeyek ji rêvebiriya Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê û rêvebiriyên saziyên herêmê hin hevdîtin pêk anîn.

Şandeya Şengalê di vê demê de bi gelek aliyên cuda re hevdîtin pêk anîn û daxwazên xwe bi wan re parve kirin. Di nav van kesan de serokwezîrê Iraqê Mustafa Kazimî jî hebû. Hemû aliyên bi wan re hevdîtin hatin kirin her çiqas erênî nêzî hevdîtinan bibin jî di qada pratîk de tu guhertin çênebû.

Di vê pêvajoyê de dewleta tirk û PDK ji bo bicihanîna peymanê zextên xwe li ser rêvebiriya Bexdayê kêm nekirin.

Hêzê artêşa Iraqê yên li herêma Şengalê bi cih bûne, di vê demê de, li ser rêvebiriya heremê her tim wek tehdîdekê hebûna xwe parastin. Herî dawî ev hêz di 10'ê adarê de xwest têkeve Şengalê.

Gêlê herêmê li dijî vê hewildana artêşa Iraqê rabû ser piyan û pêşî li wan girt. Lê tehdîda li ser Şengalê bi hemû girîngiya xwe didome.

Di bo nîqaşkirina mijarê di 15'ê adarê de şandeyek payebilindên Iraqê ku ji serokê artêş, musteşarê ewlekariya neteweyî, nûnerê karûbarên ewlekariya neteweyî pêk tê, çû Şengalê. Cara yekem bû di vê astê de şandeyek ji rêvebiriya Bexdayê li Şengalê bi Rêveberiya Xweser re li hev diciviya.

Her çiqas piştî civînê nerînên daxuyaniyên erênî hatibin dayîn jî, metirsiya li ser Şengalê dewam dikir. Roja 25'ê adarê Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê li ser hewildanên artêşa Iraqê ku dixwaze li hin deverên çiyayê Şengalê bi cih bibe, awarte li hev civiya. Piştî civînê meclisê daxuyaniyek da û diyar kir ku rêvebiriya Kazimî israr dike ku têkeve Şengalê, lê ji bilî diyalogê kî bi ser wan ve be ew ê bi her awayî li ber xwe bidin.

Bêguman rewş li herêmê pir cidî ye. Kesên di 3'ê Tebaxa 2014'an de gelê êzidî bi fermanê re rûbirû hiştin, niha dixwazin bi fermanên siyasî ve îradeya wan tune bikin. Ev êriş, êrişên bêîradekirina civaka êzidî ne. Tu cudahiya vê fermana siyasî û fermana etnîkî ji hev nîne. Li dijî van fermanan, xweparastin û xwedî li hebûna xwe derketin mafê herî rewa yê civaka êzidî ye. Divê hemû aliyên demokratîk û azadîxwaz di vê mijarê de guh bidin daxwazên gelê êzidî û dengê wan bigihînin her deverê.

# Peyman li hesabê wan nayê

Endama Nivîsgeha Jinan a Meclisa Sûriyeya Demokratîk (MSD) ya Helebê Cîhan Mihemed der barê vekişandina Tirkiyeyê ya ji Peymana Stenbolê de axivî û diyar kir ku Tirkiyeyê hem li herêmên dagirkirî hem jî li Tirkiyeyê bi hezaran sûc kirine

Navenda Nûçeyan



Tirkiye 20'ê adara vê salê, li gel hemû bertek û nerazîbûnên jinan xwe ji Peymana Stenbolê di şevekê de vekişand. Li ser vê yekê ji gelek sazî, rêxistinên jinan, siyasetmedar li hember vekişandinê bertek nîşandan û dewletên navneteweyî jî 'fikarên' xwe yên li hember vekişandinê anîn ziman.

Bertekên li hember vekişandina ji peymanê hê jî didomin. Têkildarî mijarê Endama Nivîsgeha Jinan a MSD'ê ya Helebê Cîhan Mihemed axivî.

**'Dewletê sûcên giran kirin'**

Cîhan Mihemed der barê vekişandina Tirkiyeyê ya ji peymanê, destnîşan kir ku Peymana Stenbolê ne li gorî siyaseta dewleta tirk e û wiha got: "Ji ber ku me li vir jî dît dewleta tirk li dijî jinên herêmên dagirkirî sûcên giran ên şer kirin û li dijî jinên li Tirkiyeyê jî sûcan dike. Her wiha li Tirkiyeyê dewletê piraniya jinên siyasetmedar ên ku beşdarî çalakiyên Roja Jinan a Cîhanê bûbûn girtin. Ji ber vê yekê normal e ku xwe ji vê peymanê vekişîne."

**Hincetên Tirkiyeyê**

Mihemed destnîşan kir ku siyaseta dewleta tirk xwe dispêre siyasete Îxwanê ya ku bingeha xwe ji îslameke tundrew digire û ev tişt anî ziman: "Em bi îslama nerm re ne, lê dewleta tirk rêya îslama tundrew hilbijartiye ku rola jinan a di civakê û qadên siyasî de tune dike. Ji ber vê yekê jî dewletê got Peymana Stenbolê ne li gorî pîvanên civaka li Tirkiyeyê ye, ji ber ku peyman rolek dide hevzayendan û ev yek wek hincet bi kar anîn û xwe ji peymanê vekişandin. Ev deh sal in ku Tirkiyeyê peyman mohr kiriye wê demê niha çi guhertin çêbûne? Dewleta tirk bi hezaran sûcên qetilkirin, revandin û destdirêjiyê li bajarên Tirkiyeyê û li herêmên dagirkirî pêk anîn."

**Çîçek Kobanê**

Cîhan Mihemed bal kişand ser cezayê muebedê ku dewleta tirk li Çîçek Kobanê biriye û ev tişt got: "Ji ber ku Çîçek Kobanê di dema êrîşên dagirkirina Girê Spî de erka parastina axa xwe bersivand ji lew re nabe ku mirov vê yekê paşguh bike, tu sedemên rewa û qanûnî ji vî cezayî re nîne. Wê demê çawa dewleta tirk dibêje peymaneke taybet ji bo parastina jinan ne hewce ye?"

**'Hewce ye zextek lê werekirin'**

Endama Nivîsgeha Jinan a MSD'ê ya Helebê Cîhan Mihemed di dawiyê de da zanîn ku divê zextek li dewleta tirk were kirin da ku ji peymana Stenbolê venekişe û divê dewleta tirk li şûna sûcan bike, divê siyaseteke aştiyane bide ber xwe.

# Di daxuyaniya Biden de çi hebû

Navenda Nûçeyan



Serokê Amerîkayê ji dema ku bûye serok, cara yekem e ku daxuyaniya çapemeniyê bi rojnamegeran re li dar dixe. Di daxuyaniyê de Biden li ser mijarên têkiliyên bi Çînê re, nakokiyên bi Koreya Bakur re, her wiha li ser bernameya xwe ya sed rojî ya ji bo têkoşîna li dijî koronayê axivî. Biden da xuyakirin ku di nav sed rojên desthilatiya wî de dê 200 milyon derziyên koronayê ji bo welatiyên xwe bi kar bînin.

Her wiha li ser mijara penaberên ku ji Meksîkayê tên jî rawestiya û hin pêşinyarên xwe der barê vê mijarê de pêşkêş kirin.

Der barê vekişandina leşkerên xwe ji Afganistanê jî Biden got ku ew dê di dema xwe de pêk neyê lê ew dê demeke dirêj li wir nemînin. Hêjayî gotinê ye ku serokê berê yê Amerîkayê Trump gotibû ku ew dê di serê meha gulanê de leşkerên xwe ji Afganistanê vekişînin.

Balkêş e ku di vê daxuyaniya Biden de qet behsa Sûriye, Lîbiya yan jî Rojhilata Navîn bi giştî nehate kirin. Ev yek jî dide xuyakirin ku mijarên têkildarî vê herêmê ne di rojevên sereke yên Biden de ne. An jî bi kêmanî mirov dikare bêje ku di bernameya wî ya 100 rojên pêşîn ên desthilatdariyê de mijarên ku Rojhilata Navîn eleqedar dikin tune ne.

# Nanê çeteyan li Lîbyayê namîne!

Navenda Nûçeyan

Piştî serdana wezîrên karên derve yên Almanya, Îtalya û Fransayê bo Lîbayayê û daxuyaniya wan a ji bo piştgiriya hikûmeta nû, wezîra karên derve ya hikûmeta demî ya Lîbayayê Necla Menqûş banga derxistina hemû komên çete kir.

Menqûş di civîna çapemeniyê de ya bi wezîrên karên derve yên mêvan re ku li Trablûsê pêk hat, wiha got: "Em teqez dikin ku divê hemû komên çete bi lezgînî ji welatê me derkevin." Wezîrên karên derve yên Fransa, Îtalya û Almanyayê jî piştgiriya xwe ji bo avakirina hikûmeteke nû dan xuyakirin û piştrastkirin ku ji bo amadekariyên vê yekê divê pêşî hemû komên çete derkevin derveyî sînorê vî welatî û piştre dikarin hilbijartinên xwe bikin û hikûmeta xwe ya nû ava bikin.

Wekî tê zanîn pirsgirêka sereke ya li pêşiya hikûmeta demî ya Lîbayayê hebûna komên çete ye. Lewre jî bang li Neteweyên Yekbûyî kir ku di çareserkirina vê pirsgirêkê de alîkariya wan bikin. Li gorî daneyên saziyên çavdêriya mafê mirovan hejmara komên çete yên ku li Lîbayayê mane li derdora 20 hezar çekdarî ye.

Ji aliyekî din ve Serokê Konseya Serokatiyê ya Lîbayayê Muhemed Menfî piştî serdana Misrê serdana Tirkiyeyê kir û bi rayedaran re têkildarî pirsgirêkên peymanên ku bi hikûmeta berê re hatibûn girêdan nîqaş kirin. Lê bêguman dê mijara sereke di vê hevdîtinê de jî mijara vekişandina komên çete be ji ber ku wî welatî gelek çekdar ji Sûriyeyê veguhastine Lîbyayê.



Destar

Ehmed Pelda

# Hêz û serweriya veguherînê

Hêz erkek e ku bikarî pê kar bikî. Wekî bi saya xebata kesekî ya ji bo demekê, heke tiştek biqewime wê çaxê hêz aşkera dibe û derdikeve meydanê. Ew hêz tiştekî berbiçav nîn e. Lê encama xebata bi zemanekî ye. Di encamê de berhemek pêk tê. Bi gotineke din pêkhatina berhemekê nîşana hebûna hêzê ye. Hêza herî xav ya bi bedenê, bi dest û milan e. Wekî tiştekî giran rakî, hembêzkî, bibî, bimeşînî, bihavêjî, biçikînî, hilbikî, bişkênî, çêbikî, xera bikî, xar bikî, rast bikî, vereşînî, vehûnî ... her wiha çi kar û kiryar hebin û bixwazî bikî, bi destê hêzê diafire û aşkere dibe. Encama bikaranîna hêzê guherandin û veguherandin e. Tiştekî duçarî hêzê hatibe berê bi rengekî din bû, piştre bi rengekî din e.

Tava rojê, ba, ava diherike, barana dibare jî hêz in û mijara fizîkê ne. Heywan jî xwedî hêz in û mijara jîndenasiyê ne. Ji ber ku dilivin, diçêrin, nêçîrê dikin, li ber serma û germê hewl didin xwe biparêzin. Cih diguherînin. Bi komî xwe diparêzin, an jî êriş dikin û di encamê de berhemê bi dest dixin. Lê hêza heywanan a dubarekirî ye. Her cureyek li gor rewişta xwe, laşê xwe, pêdiviyên xwe, hawirdora lê ye tevdigere û karûbarê xwe dubare dike. Peydakirin û qedandina xwarin û vexwarinê û berdewamiya sirsileta celebê xwe bi kiryarên hînbûyî pêk tînin. Plansazî û komkirina berheman, afirînerî û çêkirina navgînan bi sînor e ango ew jî dubarekirî ye.

Bi saya çêkirina merivan makîne jî êdî xwedî hêz in. Robotên heyî, makîneyên bi destê hişê çêkirî tên meşandin êdî xweberê û heyanî sînorekî kar dikin. Hêzê diafirînin. Her wiha hêza petrolê ku ya komkirî û sekinî ye, ya bê, ya tava rojê, ya avê hem bi kar tînin, hem jî li gor daxwaza merivan ji bo kar, xizmet û berhemdariyê vediguherînin. Lewma dikarin bibêjin ku ev maşîne di navbeyna hêza xwezayê û ya merivan de dibin navbeynkar. Bi vî halî hem kirdeyên hêzê ne û hem jî navgîna peydakirina hêzê ne.

Lê hêza bi destê merivan tê bikaranîn ji makîneyan jî, ji sewalan jî cudatir e. Gava hêz bi destê takekesan bikeve, tenê guherînên fizîkî pêk nayên. Berevajî wê derûnî jî diguhere. Têkiliyên kes û civak, kes û xweza, kes û maşîne û kes û heywanan jî diguhere. Bi awayekî tevbînî têkiliya meriv û hebûnên xwezayê yekser diguhere.

Ji ber ku meriv dikare hêzê kontrol bike, kom bike, li gor planan bi kar bîne. Her wiha bandora hêzê di encama berhemê û dirûvê tiştê pêkhatî de her çiqas bê xuyanê jî, ji hebûnê jî zêdetir bandorekê dihewîne. Wekî çarikek edebî ya şiîrekê li ser kevirekî bi mîxan hatibe neqişandin. Li gor wêjenasekî berhemeke hunerî û ya şairekî ye û wê zêdetir tiştek nîn e. Lê li gor arkeologekî mijara sereke hebûna nivîsê, dîroka wê û nexşên wê ne. Ji van dîtinan wêdetir, dibe ku li gor hinekan ev nivîs gotinek, ayetek xwedayî ye û kesê ew neqişandiye jî peyamnerê xwedê ye. Wê çaxê tesîra manewî ji mijarên fizîkî wêdetir hêzekê diafirîne. Lewma em dikarin bibêjin ku li gor dîtinan liv û tevger û encamên wê yên civakî, aborî, çandî, fizîkî û jîndenasî jî çêdibin.

Hînbûn, haydar bûn û afirandina merivan bêhempa ye. Wekî ji hêla derûnî ve nêzîkî mijarê bibin û ji xwe bipirsin, em ê bibînin ku haydarbûna xwedî hêzbûnê rewişta merivan gelekî diguherîne. Belkî jî serobin dike. Gava li hebûna hêza xwe haydar dibî, pê dihisî, êdî xwe wekî erkdar dibînî. Kêrhatî dibînî û li ser vê takekes dest pê dike dihizire ku gelo dîsa çibike. Dibe ku daxwaz û rewşa heyî ji hev negirin. Lewma fêrbûn, ezmûnkirin, perwerde û baştir hînbûn ji bo destpêkê dibe armanc. Ev kes li gor hemtayên xwe, xwe bi pêş dixe. Bi saya vê erka xwe, gotina xwe, hunera xwe li gor wanên din pêşdatir dibe. Ev merhaleya civakîbûna hêzê ye. Kesên li derûdorê jî ji ber vê hêzê, hînbûn, pîşe û hunerê yan nêzîk dibin an jî jê dûr dikevin. Her du jî bertek in û êdî civak li gor vê hêzê rengê xwe nîşan dide.

Hêza heyî, kêm an jî zêde derfetên serdestiyê dide kirde. Da ku kesek/kirdeyek li gor erk, huner, kiryar û karîneyê çawa hinekan bi xwe ve girê dide, hinekan jî ji xwe diqetîne û dûr dixe. Belkî bibin reqîb, neyar, dijmin an bibin hevkar û piştevanê xwedan hêzeke din.

Hêz, tenê bi bedenê dest nakeve, jê wêdatir, ya bi bandor, bi riya hiş û zanînê bidestxistina wê ye. Kesekî ku ne tenê hêza xwe yan jî kesekî, ya gelek kesan bigîhîne hev cuda ye. Xwedan erkekî girîng e. Ew ê ku dewsa hêza yekkesî hêza civatekê, komekê, rêxistinekê bi cih bike, hem hêza xwe xurt dike, hem jî hêzeke nû diafirîne. Civakîbûn û hêza komelî deriyê desthilatdariyeke nû vedike. Ji bo qanekirina takekesên xwedî yek hêzan bigihîne hev û bike hêza komî, divê zanîna kesê rêberiyê dike cuda be, planên wî, pêşkêşiyên wî xurt bin. Hêza qanehkirinê zêde be.

Her wiha ji bo sererastkirina hêzê hin rê û rêgez jî tên avakirin. Lewma, zanist, huner, ezmûn dikevin dewrê, sinc û exlaq, rê û dirb, bawermendî, sembol û mît jî tên avakirin. Bi vî awayî hêza komkirî tê efsûnkirin, ji kesan tê girtin û dibe malê civakê. Hêza civakî ew e ku her kesek li hemberî hêza wê bêhêz e. Hêza sazûmanbûyî heye û her kes di xizmetê de ye, lê kesek nikare bi kar bîne û kesek li hember derkeve nikare xwe ji afat û êrişa wê biparêze.

Li gor sazûmaniyê erka bikaranîna hêzê di destê hinekan de ye. Ew dikare vê derfetê wek dîktatorekî jî bi kar bîne, dikare wek demokratekî jî bi kar bîne. Ew êdî li gor sazûmaniya hêzê ye. Lê dîktator be jî demokrat be jî bikaranîna hêzê bi sînor e. Her wiha pergal jî vedugeherin û dewam dikin, ji hêzê feyde digirin lê li gor dewranan ew jî têk diçin. Encax hêz bêdawî ye û berdewam e.

# Wesiyet, daxwaz û xêzên şopa doza Qazî Mihemed



Kakşar Oremar

Pêşewa Qazî Mihemed:" Hûn dizanin ku ji bo standina mafên kurdan ez bi şev û rojan ranewestame, vê kedê jî bi serbilindiya xwe dizanim, heya rojeke min di vê cîhanê de mabe dest ji fîdakariyê bernadim û ez ê ji her kesî re îspat bikim ku kurd jî layiqî jiyanê ne."

**Eşqa Qazî ji tirsê mezintir bû**

Bang û daxwazên Pêşewa Qazî di bin sêdara îdamê de mijareke dîrokî ye ku dost û dijmin wekî hev li ser diaxivin. Axaftin li ser cesaret, mehkeme û parastina ku wî li gelê kurd kiribû, tije gotinên nebihîstîne.

Şeva 31'ê Adara 1947'an li qada Çar Çirayê ya bajarê Mahabadê dîrokê ew kêlî bi rindî tomar kirine. Wê şevê dîroka rojhilatê Kurdistanê kirasekî nû kire ber xwe. Qazî bi berxwedana xwe pêvajoyeke nû dabû destpêkirin. Beriya wê bi çend salan hemû hewlên xwe dabûn ku kurdan bêtir bi hebûn û dîroka wan bihesîne û îraniyan jî razî bike ku di civakeke firenetewî de sîstemeke navendî nikare desthilata xwe bi edaleteke wekhev berdewam bike. Mixabin her du aliyan jî meramên wî fêm nedikirin. Ala ku Qazî di wan salan de bilind kiribû, ala belavkirin û nasandina demokrasî, ramanên bihêz û hestên ku dûr bin ji heyecanên rojê û fanatîzma xeyalî.

**Daxwaz û hêviyên Qazî**

Li gor belge, name, nêrîn û hevpeyvînên şahidên ku li ber destê me hene, daxwazên Qazî yên ji bo guherandina civakê xwedî naverokeke pêşdetir ji wê demê bûn ku ew tê de dijiya. Hinek kesan ew nêrîn û daxwaz li cihekê kom kirine û di qalibê *"Wesiyetnameya"* wî de belav kirine, lê pêwîst e ev rastî bê zanîn ku ger Qazî Mihemed wesiyetnameyek ku xwedî naverokeke siyasî be nivîsandibe, hê jî neketiye destê me. Tenê wesiyetnameya wî ya malbatî li ber destan e ku ji hevjîna xwe Mîna xanimê re nivîsîbû. Beriya ketina komar û îdama wan lîderan Qazî Mihemed pirî caran li ser mijarên zanistî, sûdên xwendinê, pêşkeftina civakê û mijarên din axiviye. Jêdera herî baş ew hevpeyvîn, gotar û nûçe ne ku di rojnameya Kurdistanê ya serdema komarê de belav bûne. Ji rûyê wan belgeyan mirov dikare daxwazên Qazî yên herî girîng wiha rêzbend bike:

*- Yekbûn û hevgirtina we remza serkeftinê ye. Xwexapandinê ji xwe dûr bikin û di standina berpirsyarî û xizmetkirinê de hevrikiyê tevî hev nekin. Çi karê ku hûn dizanin dê xizmeta gel pê re hebe, nesekinin û encam bidin.*

*- Heya roja ku ji bindestiyê rizgar dibin dest ji şoreşê bernedin. Malê dinê ne tiştek e, ger niştimaneke we hebe, serbixwe bin, mal, ax û niştiman a we bixwe be, wê demê we yê hemû tiştekî xwe jî hebe: hem saman, hem dewlet, hem abrû û him jî niştiman.*

*- Di warê zanist û bilindkirina asta zanînê de agehiyên xwe zêde bikin da ku dijmin we nexapînin.*

*- Tu wextekê dijmin weke dost nebînin, çimkî ew dijminê netewe, niştiman û ola we ye.*

*- Ji çend rojên jiyana fanî di vê dinê de xwe nefiroşin. Dîrokê ji me re daye selimandin ku dijmin bi bihaneya herî biçûk dest bi tevkujî û serkûtkirina we dike.*

*- Xiyanetê li hev nekin, ne xiyaneta siyasî û ne jî xiyaneta malî, canî û namûsî. Xiyanetkar li cem xwedê û gel rûreş û di encamê de xiyanet dê li mirov bixwe jî vegere.*

*- Tevî wan kesan hevkarî û erkên xwe cîbicî bikin ku xayin nînin. Xwedê neke ji biyaniyan re qet nebine sîxur.*

*- Ew cihên ku min di wesiyetnameya xwe de amaje pê kiriye(mizgeft, xwendingeh û nexweşxane) yên we bixwe ne, bi awayê herî baş sûdê ji wan bistînin.*

*- Guman nakim ji xeynî mafê Xwedê, mafekî din di stûyê min de hebe, zêdebarî vê yekê jî ger kesek hest bi deynekî xwe li cem min dike bila here cem mîratgirên min.*

*- Ji mafê xwe xweş nebin û serî ji kesî re netewînin.*

*- Heya em dest nedin destê hev, serkeftin misoger nabe. Zilmê li hev nekin, çimkî xwedayê mezin dijminê zordaran e. Hêvîdar im ji gotinên min fêm bikin. Xwedayê mezin we bi ser dijminan de bi ser bixe.*

*Moradê ma nesîhet bod w goftim -*
*Mirada me şîret bûn û me gotin*
*Hevalat ba xoda kardim w raftim -*
*We dispêrim Xwedê û çûyîn"*
*Xizmetkarê gel û niştiman Mihemed Qazî "*

Bi van daxwaz û şîretên Qazî re gotineke kalikê min ê şehîd Xorşîd Nebî hate bîra min ku tim li ser zimanê babê min bû: *"Girîng nîn e pir bijî, girîng ew e ku berhemek hebe ku biselmîne tu jiyayî...."*

**Rojên komarê yên dawiyê**

Roja 21'ê çileya 1946'an serokwezîrê Îranê Qevamo Seltene (1873 -1955) wiha got:*"Ji bo ewlehiya hilbijartinên 7'ê kanûnê li Îranê, dê leşkerên Îranê biçin her dera Îranê..."*

Roja 4'ê kanûna 1946'an hêzên Îranê êrîşa li ser Azerbaycanê dan destpêkirin. Deh roj şûn de, hêzên artêşa Îranê paytexta Azerbaycanê bajarê Tebrêz xistin bin kontrola xwe û êdî ber bi Mahabad, Urmiye, Miyaneh, Miyanduawê û Kurdistanê ve meşiyan. Hêzên rejîma Îranê, bi hevkariya artêşa Brîtanyayê di 17'ê kanûna sala 1946'an de, paytexta Komara Kurdistanê Mahabad jî dagir kir. Ew roj hevçax bû li gel yeksaliya daxistina ala Îranê li ser banê îdareya ediliyê ku roja 17'ê kanûna 1945'an bi mitîngeke mezin ala HDK'ê cihê ala dewleta desthilat girtibû. Qazî li malê ma û bi çûyîna Miyanduawê û hevdîtinên bi serleşkerê Fezlulah Homayonî (1904-1994) re şertên xwe raberî wî kirin:*"Ger kar û kiryarên ku we li Tebrêzê encam dan hûn bixwazin li Mahabadê jî bikin, em ê bi hemû hêza xwe şerê we bikin..., em nahêlin hûn bi rêya hinek eşîretên talanker û leşkerê xwe bajarên me wêran û malê xelkê talan bikin."*

Qazî Mihemed û General Mihemed Husênxanê Sêyfê Qazî jî êdî nehiştin vegerin malên xwe. Ebulqasim Sedrê Qazî endamê parlamentoyê yê dewra 14'an jî bi destûra rayedarên artêşa Îranê ji Tehranê anîn Mahabadê. Ew her sê li biryargeha leşkerî a bajarê Mahabadê hatin girtin û di bin çavdêriyeke tund a wan de carna zarok û kesên din ên malbatê jî dihatin dîtina wan. Di rojên destpêka têkçûna komarê de, berpirsên dewletê hinek nerm lê piştre wekî kesên qafseqet dest bi êrişên lefzî û gotinên dûr ji nezaketê tevî her sê kesên girtî kirin. Malên wan teftîş û çi tiştekî bihagir ku li malên wan hebûn ji xwe re birin an jî baştir bêjim dizîn. Qazî Mihemed dema wiha dibîne, şîreta li wan dike ku sînorê kiryarên xwe bizanibin. Ew bi kûraya hemû rihê xwe yê paqij temaşevan û guhdarên xwe heyrî dihêle. Ji rûyê bîranînên kesên ku wan rojan şahidên rûdanên li Mahabadê bûn ew rastî derdikevin holê ku rêberên kurd bi hemû cesareta xwe li hemberî gefên berpirsên dewletê sekinîne û nehiştine ku bi navê wan bêrêziyê li kurd, Kurdistan û wan bixwe jî bikin. Berpirsên mehkemê bi dîtina rewşeke wiha re êdî bi tirs û dudilî tevî wan axivîne û mehkemeya leşkerî dane meşandin. Çend caran karê dadgehê ji ber îtiraz û dijberiya girtiyên kurd neçar bi navbereke direj re dîsa ji nû ve karê xwe dane meşandin. Qazî û Heme Husên bi baldarî li wan û wateya peyvên ku ji zimanê wan hatine bihîstin guhdarî kirine. Li ku dera ku sivikatî bi gelê kurd hebûye ew bêtirs rabûne ser piyan û li dijî wan axivîne. Ew dijberî carna bûye sedem ku Qazî Muhemed êrişî wan jî bike; hêrişên lefzî û fizîkî.

Di hemû dema ku ew di girtîgeha leşkerî de bûn, awayê dan û standina îraniyan li ser esasê derew û xapandinê dimeşiya. Ji Qazî re digotin: ***"Em ê we bişînin Tehranê û mehkeme dê li wira berdewam be, li vira hemû biryar nayên dayîn."*** Caran jî ji wan re digotin: *"Hûn ê ber bi navenda Îranê ve bên sirgûnkirin û xwe amade bikin û bila ji malê tiştên pêdivî ji we re bînin..."*

**Şeva îdamê**


Êvariya roja yekşemiyê 30'yê adarê dema ku her sê Qazî di girtîgeha leşkerî de bûn xeber hat ku: ***"Xwe amade bikin hûn ê îşev ber bi Tehranê ve bên şandin."*** Ew çend meh bûn ku mehkemeya wan li Mahabadê bi dawî bibû. Wê şevê bi wesayitên leşkerî berê Qazî Mihemed û piştre jî her du hevalên wî di tarîtiya şevê de ber bi qada Çar Çirayê birin. Ew ne bi hev re û ne jî di saetekê de belkî her yek ji wan cuda-cuda siwarî zîlên leşkerî kirin ku 12 leşkerên çekdar jî li rex wan rûniştî bûn, ji biryargeha leşkerî derxistin. Dema gihîştin qada Çiar Çirayê Pêşewa Qazî sêdareya amadebûyî dît, êdî zû pê hesiya ku hemû gotinên rayedarên artêşê derew bûn. Li wira jê re wiha gotin:"Hûn tên îdamkirin û xwe amade bikin, ger wesiyeteke we heye binivîsin...". Ew bi xemeke giran lê bêtirs daxwaz kir ku: ***"Bira û pismamê min bêsûc in, hemû karên ku hatine kirin bi emrê min bûne, nabe hûn kesên bêguneh îdam bikin..."*** Lê ew daxwaz nehatin pejirandin û Qazî piştî nimêj û nivîsandina wesiyetnameya xwe ya malbatî û hinek şîretên ku li mela Sidîq kirin, ber bi sêdara îdamê ve çû. Nehişt ku çavên wî bigirin û êdî sibeha roja duşemiyê nêzîk bû dema ku Seyfê Qazî û Sedrê Qazî jî cuda ji hev anîn qada îdamê. General Heme Husênxan dema ku sêdara Pêşewa Qazî dibîne bi qêrînên ji dil hêrîşî leşkerên Îranê dike. Li ber liv û lebatê dema werîsê îdamê di stûyê wî de ye, werîs diqete, vê carê wî li erdê dikujin û careke din dadileqînin. Sedrê Qazî jî saet 5'ê berê sibê anîn qadê û îdam kirin.

Duşem û tenê deh roj ji bihara wê salê derbas bibûn, piştî dema çar mehan sibeha roja 31'ê Adara sala 1947'an termê her sê Qaziyên Mahabadê bi werîsên sêdarê li qada Çiar Çirayê destpêka xemgîntirîn roja bajarê Mahabadê dabûn destpêkirin. Li ser axa xwe şehîd bûn û di nav dilê wê axê de jî hatin veşartin.

Ji bîr nekin gotineke bab-kalên me wiha dibêje: "Bi yekbûna du kesan gundek bi wan nikare" û „bi yekbûna kurdan re jî êdî rîsê dijmin dê bibe xurî."



Qazî Mihemed



*Xwendevanên Kurd, roja ragihandina Komara Kurdistanê - Mahabad / 22.01.1946*

**Jêder û çavkanî:**

**Hevpeyvîn tevî: 1. Seroka Yekîtî Yayanî Kurdistan - Mîna Qazî, 2. Wezîr Perwerdê - Menaf Kerîmî, 3. Serkreterê buroya Qazî Mihemed- Seîdxan Homayon , 4. Xwendevanê serdema komarê Izet Silêmanbegê Dergeleyî*

**Bîranînên babê min Cibrayîl Xorşîd Nebî (Hevpeyvîna min û çend kesên din pê re)*

**Bîranînên Ehmed Qewamo Seltene, serokwezîrê Îranê yê demê*

**Nivîsa wikipedia li ser Hikûmeta Millî a Azerbaycanê (bi farisî )*

**Rojnameya Kurdistan hejmara 72 sêşem, Gelawêja sala 1946-1325*

# Ceynika bêderde

Turabî Kîşin

Ceynikê cirê domanî nêbenê, rojê hêlê Heqî ra pê manena, dîganîya. Vana "Heqî çend serî yo domanî nêdayî mi. Ez nî pirênê domanê xo berî ceyniyêde bêderde cirê biderzo. Belkî Heq derdê nî dergûşê mi nêdo." Bena hetê kamcî ceynike pêro ci rê derdê xo qesî kenê, nêdana ci.

Nêdana ci, ci ra vanê "Şo filan ceyniyê hanîka filan ca de, derdê aye çînîyo, a bêderd a."

A bêderd a... Na dana raye şona kewer kûna, ceynike kewer kena ya. Kewer kena ya ke ceynike binê lingan ra hetanê sere sarî pêro pîya ebe zernan xemelnawa. Na ver ra matê ci manena.

Ceynike vana "Bê zere ti qeyî nêna zere."

Şona zere, ceynika kêyî vana "To xêr a"

Na ceynike vana "Wîle mi xêra, ez ama cend serîyo mi rê domanî nêbîyêne, teze pê menda. Mi vato ez nî pirênî berî hetê ceynikê de bêderde de wa mi rê biderza ke belkî ez derdê cîgere mancî"

Ceynika kêyî vana "Tamam wayê bê ronîşe."

Nûşena ro. Ceynike non dana ci awe dana ci. Bena jû odike de dana we. Vana "To na odike de xo wade, mêrdê mi şande êno, wa to mevêno, mezano to îtara. Bî şodir ke merdê mi şî ez pirênê to derzena."

Ceynike a odikede vindena, qayt kena ke mêrde ame. Astorê binî rewano, astor reqesîno. Ceynike şona astorî gêna ancena zere. Mêrde virnîya aye êno zere, a kî dime êna.

Mêrde lal û kero. Ceynike awe ana lingan şûna, non ana ver, nonê xo weno, lal û kero.

Lal û kero... Na vana belkîcî zonê nî mêrikî çînîyo, no lal û kero.

Maneno waxtê rakewtene, beno hermê ceynike ra, koşede çîyê aznayê diwarî yo î dêmdano hard. Ceynika bîne henî zen kena ke xalî aznayê diwarî yo, oxro ke henî nîyo, mêrik paçê serî keno ya ke cinaza tedero.

Paçê serî keno ya dêmdano hard û ceynike kî dêmdano ver û kindirê xo gêno aye û î pîya pêşeno. Şono oda xo de kûno ra.

Kûno ra... Na ceynika bîne ax kena wax kena "No derdo nîya bêbav çi yo? Ya Rebî no çi bî?"

Maneno şodir, şodir vazeno ra êno î kindirî keno ya, rêna î cinazê î pacîdê pêşeno û beno koşê de tîk keno.

Tîk keno... Na ceynike vazena ra zê verî nonê deyî awa deyî ana ver. Mêrik weno, ayera dime waxtê şîyayîşê xo êno. Eke dano raye şono, na ceynike cî dima mêrikî dana raye şona. Na ceynika ma cî qubike de piro sêr kena. Qayt kena ke ceynike rêna şîye ci rê astor zerede zên û gem kerd ard. Ci rê pê dizgîn girot, mêrikî lîngê kerde ser ra şî.

Kerde ser ra şî... Ceynike êna zere, venga a ceynika bîne dana û vana "Wayê bê non bore."

Ceynike vana "Ez çi non borî, emşo ez tewû nêhunijîya, hewn nêkewt çimanê mi. Emşo no çibî mi dî. No çiko çi tawawo, derdê xo mi rê vace ez xo rê şorî."

Vana "Derdê mi owo ke, mêrdê mi seyîsêde xo bî, qaytê astorê mêrdê mi kerdêne. Seyîs sîya bî. Mi kî nêzanitêne ke mêrdê mi kîn dano girê. Mi tirî arde ma pîya werde. Tasa ke mi tirî kerdbî ci a tase rengê xo sipê bî. Rengê tirî kî sîya bî. Mi kî xeto kerde mi va 'Hela qaytê tasa sipîye û tirîya sîyaye se jubinî ra amê.' Î kî va ke 'Eya wule ez zana seyîsê min o sîya û to kî jûbinî ra ênê.' Ez henî pa mat menda. Uştra şî. Oxro ke seyîs kişto. Derman kerdo ke boye medo. Aye ra dime pîşto ardo na oda. A roje ra hetanû na roje pê mi ro zulm keno."

Ceynika bîne vana "Wî derd serê nî derdîra çînîyo. Hetanû nika to se tewat kerdo. To se vengê xo nêveto?"

Ceynike vana "Ez derdê xo kamîra vacî. Şar tewer ra qayt keno, ez urtê zern û sêman dera. Henî zen kenê ke ez bêderd a. Ez veng bikerî kî kes pê mi înam nêkeno?"

Ceynika bîne urzena ra pirênê xo gêna vana "Mi fam kerd ke ceynika bêderde çînîya. Ez xo rê urzî ra şorî kê xo"

Urzena ra xatir wazena û kûna raya kê xo û şona pirênê pitê xo a be xo derzena...



# Dayîka Aştîye Kumru Akgule: CPT ho ça de yo?

Roj çina ke zîndan û vera ê ke şonê pêvînayîşanê tepişteyan ra xebera teda, îşkence, zilm û binpaykerdişê heqan nêra. Dayîka Aştîye Kumru Akgule zî înan ra yew a. Dayîka Akgule qala hîkayeya xo û serebûtanê ke ci sere ameyî kerde. Dayîka Kumru mabênê serranê 2018-2019î de wextê grevê vêşanîye de verê Zîndanê Bakirkoyî de ameyî destbendkerdene.

Dayîke Kumru vat: ''Ma 10ê gulana 2019î de verê Zîndanê Bakirkoyî de ameyî destbendkerdene. Polîsan ma berdî Asayîşê Stenbolî, uca de 7 polîsanê ke hetê serre ra qasê tornanê mi bîyî rixmê feryadê mi zî pê zorî kincê mi mi ra kerdî. Înan şerm zî nêkerd ez kerda kamera. Reya verêne çîyêko winasên amebi sereyê mi. Heq û hedê çewî çin o ke merdimêk zûrt bikero. Ma mehekem de qala ney kerde la mehkeme çîyêk nêkerd. La ma sey dadîyan semedo ke wazenê domanê ma biciwîyê yenê muhakemekerdene.''

**'Binpaykerdişê heqan zêdîyayî'**

Dayîke Kumru ard ziwan ke nika zî heman proses esto û vera tecrîdî reyna tepişteyî grevê vêşanîye kenê. Dayîke Kumru vat: ''Na pandemî de binpaykerdişê heqanê merdiman reyka zêdîyayî. Tecrîd sûcê merdimîye yo. Birayê mi Erdal Ozenî rê cezaya 16 serran dîyaye û nika hucreyê yewkesî de yo. Tede şeker, şîzofrenî û nêweşîya roqleyan estê. Wexto ke krîz ame ci herinda nêweşxaneyî de ame berdene bi ocaxê weşîye.''

**'CPT ho ça de yo?'**

Dayîke Kumru îfade kerd ke ganî waştişê tepişteyan bêrê caardene û tepişteyê nêweşî bêrê veradayene. Dayîke Kumru vat: ''Ez bi taybetî venga CPTyî dana. CPT ho ça de yo? Ê feryadê dadîyan nêeşnawenê? Nika zî ê qala qefilnayîşê HDPyî kenê. Heta ke dadîyî estbê ê nêeşkenê HDP biqefilnê. Wa no zulm hînî biqedo, bes o. Wa berê Îmraliyî bêrê akerdene û Birêz Ocalan keye û avûkatanê xo bivîno.'' ***STENBOL***






## Aydemîr: Polîtîkaya rantî yena rayraberdene

Wekîlê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) yê Çewlîgî Erdal Aydemîr meseleya laserî berd meclîs û pêşnîyaznameyê persî da wezîrê Şaristanî û Dorme Murat Kurum û wezîrê Binawanîye û Resnayîşî Adil Karaîsmaîloglu ke cevab bidî persanê ci.

Aydemîrî pêşnîyaznameyê xo de vat ke çiqas Çewlîg de varayîş bibo bajar de xisarê girdî virazîyenê û wina va: "Bi serrano ke meseleya binawanîya bajarî nîna çareserkerdene. Xoza yena texrîbkerdene û qeraxê dereyan îmarî rê yenê akerdene. Çiqas varayîş bibo bajar de xisarê girdî virazîyenê. Çiqas hetê îmarî de îqaz bibî zî polîtîkaya rantî yena rayraberdene. Beno ke rojanê aver de tepîya agêrayîşê nê probleman çinî bo."

Aydemîrî qiseykerdişê xo yê peyênan de persanê xo pers kerd û va: "Derheqê îmarî de do tehqîqatêk bêro akerdene? Hetê awanîsazîyê bajarî yê çarpikî de do xebatêk bêra kerdene? Heta nika şima rê qet xeberêka kêmîya binawanîyan ameya? Hetê çareserkerdişê problemanê binawanîyan de xebatêka şima esta?" ***ANQARA***



## Hemwelatî: Kesêk vengê ma nêeşnaweno

Xirakerdiş û polîtîkayê ke yenê rayraberdene vera heywankarî verê çinbîyayîşî de yo. Hemwelatîyo bi nameyê Alî Metîn Kalayo ke dewa Avzunikî ya qezaya Pêrtagî ya Dêrsimî de cuyeno qala problemanê heywankarîye kerd. Kala da zanayene ke do roja Îne semedê ê ke şonê wareyan do îhale virazîyo û wina dewam kerd: "Verê cû yewî (Yewîya Mî Bizan ê Dêrsimî) îhale viraştêne, la no serre do walîtî viraza. Coka ra no sere vaye zêde ya. Ê ke rewşa înan sey ma xirab ê do se bikerê. Tena wextê reyan de şar yeno tîya û ma oerseno. Rewşêka winasî de rayaumûmî nîna viraştene. Ma do senî şorî wareyan? Rewşa ma nêfikirenê. Wextê weçînayîşî de de yenê rayan wazenê. Ma bi rayîrê şima wazenê vengê xo bidî eşnawitene ke hetkarîya ma bikerê." ***DÊRSIM***

## Yewîya Ewropa peyê bazirganîye de ya

Kombîyayîşê berzî yê lîderanê Yewîya Ewropa de demokrasî û heqê merdiman nêameyî dîyene. Kombîyayîşî ra dima lîderan pare kerd ke ê wazenê Tirkîya reyde têkilîyanê xo xurtêr bikerê. Eşkerayîye de ama vatene ke pisporî do babeta newekerdişê yewîya gumrukî yê bi Tirkîya de dest pê karî bikerê. Lîderanê welatanê Ewropa îfade kerd ke ê do hezîrane de qeraxanê Yunanîstanî de cigêrayîşê gazî yê Tirkîya biercnê. ***BRUKSEL***

# Rampayê Farqînê

Kêm zêde her kesî çîrok û meseleyên li ser kaşê Farqînê ku di nav farqîniyan de wekî rampayê Farqînê tê naskirin bihîstiye. Ez ê zêde behsa wan çîrokan nekim. Tenê ji bo kesên ku çîrokên vî kaşê Farqînê nebihîstine, ez ê behsa çîrokekê bikim.


Di demên berê de, dizên Farqînê li nêzî vî kaşî bi cih dibûn, li hêviya kamyonên barhilgir bûn. Dema wesayît dikete wî kaşî, nikaribû bi lez biçûya, ji ber ku kaşekî dirêj û bilind e.

Carekê mirovek ji Mûşê hin berxan dikire û dixwaze wan bibe li Stenbolê bifiroşe. Vî zilamî berê çîrokên kaşê Farqînê bihîstibû lewre got ez ê ji xwe re cilekî ji hiriya berxan çêbikim û bi ser xwe de bikim. Dema dizan xwe avêt nav kamyonê ez ê wan bigirim.


Ez serê we neêşînim. Dema ku gihan kaş dizekî xwe avêt nav kamyonê û hema di cih de dest pê kir, her carê destê xwe davêt pirça berxekî û ew davêt xwarê. Dema ku çavê xwediyê berxan bi diz ket, qidûmê wî şikestin, dît ku zilamekî wek dêwekî ye. Beriya ku zilamê xwediyê berxan dengê xwe bike hema yê diz bi pirça wî girt û xwest ku wî jî bavêje xwarê. Mêrik kir qajîn û hewar û got; heyra tu çend berxan davêjî bavêje lê di bextê te de me min navêje xwarê.

Ev yek ji çîrokan bû lê vê dawiyê veresyoneke nû jî bi çîrokên vî kaşî vekiribûn. Dibêjin şaredariyê gazî komeke farqînî kiriye û ji wan re gotiye ka bêjin daxwazên we çi ne, heke hûn bixwazim em ê ji we re rê, pir an jî balafirgehekê li vir çêbikin. Wan gotiye na heyra, hema ji me re rampayekî ji vî kaşê me bilintir çêbikin bes e, me tiştek din navê. Bila farqînî dilê xwe ji min negirin ha ez jî farqînî me.

**Eliyê Silîvî**




# Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî me ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin.

**1-**Tiştek min heye
Çar ling e
Çav spehî ye
Tenişt belek e
De bêjin ew çi ye?“

**2-**Tiştek min heye
Çarsim axa
Li nav taxa

**3-**Tiştek heye
Çavek heye, serî nîne
Ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

**Bersivên me ev in:**

**1-** Xezal **2-** Ker **3-** Derzî

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin. De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Şoyek sabûn**
**Du şo sabûn**
**Sê şo sabûn**
**Çar şo sabûn**
**Pênc şo sabûn**
**Şeş şo sabûn**


→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Şalên sofî şeş gaz in**
**Her şeş şal şalê sofî ne**

→ Heke ew jî nebû dê sedî sed ev çêbibe:
**Tucaro tu çi tucarî**



***Çavkanî: Zûgotinok***
***Berhevkar: Mihemedê Kurdo***

# XAÇEPIRS




**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Bersiva erênî 3. Raz
5. Paşnavê helbestkarekî kurd Ehmedê…. 6. Bajarekî rojhilatê Kurdistanê
7. Arvan 9. şêweyek, tarzek
12. Kestî, wesayiteke deryayê ya barhilgir 14. Xwelî
15. Gelekî herêmê yê bi qirkirineke mezin re rû bi rû mabû 17. Cînavkeke pirjimar
18. Ji bo 22. Hezkirin

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Cebhe, ber
2. Danekî dawiya rojê
3. Noteke muzîkê
4. Dirb, cihê pêveçûnê
5. Dafik, kemîn
7. Xelkê Afganistanê
8. Wext, mawe
10. Mihele, tar 11. Êl
13. Serhişkî
14. Spasî û pesindan
16. Camêr, canik
19. Mez,nê eşîrê, an jî mezinê gund ê xwedî mal û milkên gundekî
20. Ne bejî, zeviya ku tê avdan
21. Cînavka takekesî ya pirsiyariyê
23. Cihê ku genim lê tê hêran

Bersiva hefteya borî



# Neqşeke wateyî: Tarîkoj

Yaşar Aslan

Tarîkoj pirtûkeke biçûk lê bi naveroka xwe tijî wate ye. Her çiqas weşanxaneyê ev pirtûk wekî pirtûka felsefeyê bi nav kiribe jî ev cure aforîzma ye (bi fransî) an jî wecîz e (bi erebî) ku tê wateya gotina cewherî û xweş; ango dîtinekê, ramanakê, hestekê, riknekê bi gotinên kurt û vebirî derpêş û pêşanîn dike.

Di 'Tarîkoj'ê de nivîskar-helbestkar Hecî Nehsan li ser jiyan, şer, bîrdozî, huner, helbest, wêje, evîn, bêrîkirin û hwd. dîtinên kurt vedibêje. Ji sala 2012'an heya 2017'an fikrên xwe bi kurtasî nîşe kirine, komî ser hev kirine û navê pirtûka xwe kiriye kojtina tariyê.

Vêna jî bi wecîzeyekê di serê pirtûkê de nivîsiye:

*"Carina peyvek têra wateyekê nake*

*Carina jî du wate têra peyvekê nakin*

*Carina divê wate ji bo peyvê were xeritandin*

*Carina jî divê mezinahiya peyvê ji wateyê re bimîne"*

Hecî Nehsan nivîskar-helbestkarekî berhemdar e. Ji sala 1997'an ve di girtîgehê de ye. Ew di sala 1974'an de li gundê Korikê ku girêdayî Kobaniyê ye (bi gotina wî Kobanîka) hatiye dinyayê. Nivîsên wî di kovaran de, karîkatûr û wêneyên ku wî çêkirine di çapemeniya azad de derdikevin. Digel ku di mercên dijwar ên girtîgehê de ye jî ew her dinivîsîne. Heta niha deh pirtûkên wî hatine çapkirin. Pirtûkên wî ji hêçan, helbest û çîrokan pêk tên. Tarîkoj wekî pirtûka yekemîn a aforîzma ye ku bi kurdî hatiye nivîsandin (heger berê hebin jî min nebihîstiye. Hebin jî pir kêm in).

Nivîskar dîtinên xwe bi gotinên kurt û cewherî di her warî de anîne ziman. Çend aforîzmayên wî:

*Helbest êşeke estetîk e.*

*

*Xêlî ji bo bûkê kefenê dilxweşiyê ye.*

*

*Ku mirin tunebûya dê mirov tiştekî ji mirinê xerabtir peyda bikira.*

*

*Raza jiyanê di nav jiyînê de ye, ne di nav xeyalkirina jiyanê de ye.*

*


*Pirs ji peyvan peyva herî serhildêr e.*

*

*Gilîkirina ji jiyanê gazîkirina mirinê ye.*

Bi vî awayî wecîzeyên bi kurt û kurmancî di pirtûkê de cih digirin. Nivîskar xwestiye bi vê hewla xwe asoya xwe û xwîner fireh bike. Bi cuda cuda lênêrînan, tîr û rim di hin têgîn û qaliban de rakiriye. Gava êrîşî qaliban kiriye, hevsengiyeke diyalektîkî ya rast di navbera kes û civakê de ava kiriye.

Ev pirtûk yek ji dewlemendiya berhemdariya kurdî ye, li benda xwendina me ye.




***Navê pirtûkê: TARÎKOJ***
***Nivîskar: Hecî NEHSAN***
***Cure: Aforîzma/Wecîze***
***Weşanxane: Aryen***
***Çapa yekem: Enqere – Hezîran - 2018***
***Rûpel:71***

# Nîşanê 9 salî û hewldana wî ya parastina ziman

Navenda Nûçeyan

Nîşan Doxan zarokek 9 salî ye, bi malbata xwe re li Almanyayê dijî û bi alîkariya bavê xwe yê derhêner Deysem Doxan vîdeoyan çêdike û li ser medyaya civakî parve dike. Doxan di her vîdeoyên xwe de bal dikişîne ser girîngiya mijara zimanê zikmakî. Vîdeoyên wî ji çar aliyê Kurdistanê, bi dehhezaran kes temaşe û parve dikin.



Malbata Doxan 9 sal berê ji Tirbesipiya rojavayê Kurdistan koçî Almanyayê kiriye û li wir dijîn. Em di derheqê xebatên wan de bi bavê Nîşan Doxan, derhêner Deysem Doxan re axivîn.

Derhêner Deysem Doxan di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser şopdarên kanala ku bi navê kurê wî Nîşan Doxan hatiye vekirin û ev agahî dan: "Em vîdeoyan çêdikin û li ser medyaya civakî parve dikin. Ji çar aliyên Kurdistanê bi hezaran şopdarên vîdeoyên Nîşan Doxan hene. Ev hesteke pir xweş e lê di heman demê de barekî giran e ku em mijaran ji hemû rengên jiyana kurdan ji her çar aliyên Kurdistanê amade bikin û pêşkeş bikin."

Deysem Doxan diyar kir ku dema wan dest bi xebatên xwe kirine çend xalan ji xwe re kirine armanc û ev tişt anî ziman: "Xala yekem rexnekirina hin mijar û şêwejên jiyanê yên ku em di nêrîna xwe de çewt dibînin. Bêguman anîna mijarên hestewar û nedirust di rojevê de û bi taybetî bi rêya vîdyoyan bêhtir di nav civakê de belav dibe ango bandora xwe dilîze. Lewma hilbijartina şêwe û rengê textan ji aliyê derhêner û senarîst Rodî Heme ve bi zanebûn û plan pêk tên û ji aliyê min ve jî tê eyarkirin. Armanca me ya duyem jî bi taybetî di nav civaka ewropî de zindîhiştina ziman e."


Derhêner Doxan da zanîn ku hilbijartina mijaran girêdayî rojev kurdan e û wiha axivî: "Di mirajên vîdeoyan de bi awakî giştî çîrokên ji dîrok û folklorên herêmî yên peyamên kûr ku di nav de hene, em hildibijêrin. Bi piranî di nav peyv û hevokên me de ahengek heye, em bi vê terzê dixwazin ku şêweya komediyê xweştir bibe. Lê yek ji armancan jî ew e ku bi hêsanî bê jiberkirin û di nav temaşevanan de zû belav bibe."

Deysem Doxan li ser xelata Dr. Faraj Remmo ku ji serokkomarê Almanyayê girtiye û dide kesên ku serkeftî dibin de wiha got: "Bi rastî xelata ku me girt cihê serbilindiyê ye. Dema Nîşan xelat girt em gihiştin wê baweriyê ku karekî serkeftî pêşkeş dikin û li ser rêya rast dimeşin. Ew xelat deriyeke nû ji me re vekir ku em bi zimanê xwe xelatên din jî bikin armanc."

**Banga Nîşan ji bo kurdan**

Her wiha Nîşan Doxan ku bi vîdeoyên xwe parastina zimanê zimakî dike û dibêje "Ez kurd im zimanê min kurdî ye", wiha bang li kurdan dike: "Banga min ji kurdan re ew e ku bi hemû bîr û baweriyên xwe yên cuda ji hev hez bikin. Her wiha banga min ji bo zarokên kurdan jî ew e, li ser şaşiyên pêşiyan mezin nebin û li ser zimanê xwe yên zikmakî kesayetiyeke xwe ya taybet ava bikin."





Sîdar Jîr

# "EZDA" malzarokeke derbkirî ye

Her serdem xwedî sembolên gelekî taybet in. Bi gelek remz û nîşanan tê nasîn û bibîranîn. Carinan çîroka pîrejinekê, carinan kilama dengbêjekî, stranek, helbestek û carinan jî bi 'dolmîşeke şîn'… EZDA çîroka serdemeke tijî êş a bajarekî ye.

Bi romana Rengîn Kardelen a bi navê EZDA, nifşek ji nişka ve li zarokatiya xwe, li ciwaniya xwe vedigere. Çîrokeke gelekî tê zanîn a dawiya sedsala borî ye ku mekan Amed e. EZDA jî bêhemdê me, me dibe û li sûka Amedê digerîne û rê li ber 'serboriyên' çizîniyê ji dil tîne vedike.

EZDA di eslê xwe de navê lehenga Kardelenê ye û navê xwe daye romanê jî. Ezda wekî sembolеke ji mîtolojyê hatiye danisilandin û di dawiya sedsala bîstan de li bajarê Amedê vepejiliye hatiye vegotin. Qewimînên di wan salan de ku li Amedê rûdidin, bi vegotineke samîmî li derdora Ezda, Amed Kîtabevî, Şênê û Dolmîşa Şîn û hwd tê hûnandin. Her yek ji wan bi mîsyonekê di romanê de cih digire. Ezda keçek e û wekî ruhê hebûn û xwebûna civaka kurdan ku ji serdema mîtolojîk û heta wê demê, bi serboriyên miletekî hatiye strandin tê vegotin. Amed Kîtabevî, wekî şikefta ku Platon lê rastî dîtiye û ji bilî yên wek wî kes newêre nêzîkî wê şikeftê bibe bûye mekanekî xurt. Şênê jî wekî siya di şikefta Platonî de hem rastî ye hem jî xeyal e, lê her dem hêvî ye. Di vê atmosferê de ew "Dolmîşa Şîn" ku sembola xerabî û windakirinê ye tim û daîm tirsa wê wekî ya hûtê heftserî di dilê şêniyên bajêr de ye. Wekî kozika "nêçîrvanên mirovan" an jî kana xerabiyê ye. Kesên ku gelek caran rûpoşkirî ne… Carinan tajiyên ji serdema arkaîk in ku nêçîra xezalan dikin û carinan jî kewên dijminên qewmê xwe ne ew ên rûpoşkirî.

Rengîn Kardelen, bi têkiliya hişî ya Ezdayê ku ligel Achilles ê lehengê mîtolojiya grekiyan e hewl daye serdestiya mêrane ya civakî û ya li ser jinan jî vebêje.

Her çiqas çîrok bi awayekî sembolîk li derdora Amed Kîtabevî, jina ciwan a bi navê Ezda ku sembola nasnameya jinan here û were jî, di bingeha xwe de hişyarbûna civakî di ser êşekê re vedibêje.

Romanûsê di ser Ezdaya lehenga romanê re rewşa exlaqî, ruhî û dilînî ya cografyayek fireh a Mezopotamya û derdora wê vedibêje. Bi Achilles ê ku "lehengê" Ezdayê ye jî aliyê pozîtîvîst ê Rojava bi awayekî ji awayan digihîne hawara wê cografyayê.

EZDA, romanek bîra civakî ye. Rengîn Kardelen, di ser lehenga xwe Ezdayê re, şerê tarîtî û ronahiyê vedibêje. Lê qada şer malzaroka derbkirî ya jinekê ye.

Di wêneyê giştî yê romana EZDA'yê de, xwîna ji malzaroka derbkirî ya Ezdayê tê dibe lehiyek û dolmîşa şîn tev li kesên rûpoşkirî dide ber xwe û berê cografyayeke berfireh dide ronahiyê…

****EZDA, Rengîn Kardelen, Roman, Weşanên Lîs, 2020***

xwebûn

29 Adar-4 Nîsan 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 67

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** İdris Gürmez
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85

# Vîrûsa koronayê (Kovîd-19)

Xecê Bîşeng

Vîrûsa koronayê di kanûna 2019'an de li bajarê Wûhanê yê Çînê derket. Çawa derketiye û ji ber çi derketiye, bi dehan sedem hatin diyarkirin. Li serê gelek tişt hatin gotin û nivîs hatin nivîsîn. Di serê nexweşiyê de, diktoran got ev nexweşî nexweşiyek ku mirov ji hev digirin û metirsî heye ku li dinyayê gişî belav bibe. Di demeke kurt de tişta jê ditirsiyan qewimî. Bi lez her der û welatî da ber xwe û paşê wekî pandemî hat binavkirin. Yanî vîrûsa koronayê wekî nexweşiya tevahiya dinyayê hat ragihandin. Bi vê re jî tirseke mezin ket nav mirovên li çar hêlên dinyayê. Mijara pêşî a mirovan bû vîrusa koronayê. Ne neheq bûn jî. Ji ber ku yên bi vê nexweşiyê diketin û pê dimirin zêde bûn û rê li ber girtin zehmet bû.

Kovîd-19 bû êşa dinyayê. Cara ewil ez jî bûm şahidê êşekê ku dinya giş pêketiye. Êşa hemû kesên li dinyayê dijîn yek bû. Dinya bû zindanek servekirî. Mirovan ji şaneşînan silav didan hev. Ji ber qedexeyên kolanan, kolanên welatên mezin vala mabûn. Karantîna bû parçeyek ji jiyana mirovan.

Ewrên koronayê ezmanê welatê me jî zeft kir. Gava nû derketibû kesî bawer nedikir ewqas zû bigihîje vir. Wê dermanek peyde nebe? Ma tu li ku Çîn li ku! Lê, wiha nebû. Wek ku bizrê vîrûsa koronayê li erdê dinyayê reşandin, li sereanserî dinyayê şîn hat û rehên xwe gihand welatê me jî. Di demeke kurt de, nexweşxane bi dev re bûn ji nexweş û miriyan, bi sedan diktor û xebatkarên tenduristiyê ji ber nexweşiya koronayê mirin!

"Vîrûsa koronayê heye an tune ye?", "Giş derew in!", "Çêkirine û xistine nav mirovan", "Gelo nexweşiyek bi vî navî û vî rengî çêbû?", "Dewletên ewqas mezin bira jî nikaribûn pê?", "Bi zanebûn xistine nav însanan û bi zanebûn dermanan nabînin…!" Peyvên wiha dipekiyan ji devê mirovan. Nîvê xelkê bawer nedikir nexweşiyek wiha hebe. Digotin ji bo me gişan bikujin! Ji xwe re navek lêkirine.

Vîrûsa koronayê peyvên nû jî afirandin. Mesela peyva "Dinya zindana servekirî ye" ji serê nexweşiyê ve ji ser zimanan neketiye. Hema kî bigihê hev dibêjin "Em di hundir de fetisîn", "Beecîn", "Dinya bûye zindana servekirî", "Bûye hefsa bêgardiyan", "Em ketine hefsa malê"…

"Dinya zindana servekirî ye", "Em bûne hefsî." Gazinên wiha meriv li rewşa girtiyan dide fikirandin. Mesela girtî vê peyvê bi çi hawî dibêjin. Jixwe ew berê di hefsê de ne, vê nexweşiyê maneyek ji dewletê re jî çêkir. Hevdîtinên bêhnvedan rakirin. Werjîş karên hunerî giş sekinandin û hevdîtina rû bi rû ya bi malbatan re jî rakirin. Tew dibêjin hemû kar û bar û têkilî wê di demên pêş de bibin dijîtal. Girtî jî wiha dibêjin; "Em di zindanê de di hundirê zindanê de ne." Ne fêmkirina rewşa girtiyan ji hêla kesên li derve wek "kesên ne li mala, nizane bi hala" be…

Di dema vîrûsa koronayê de, di nav mirovan de, tevgerên cuda cuda jî çêbûn. Dîmenên wiha jî hebûn: xweş bûn an nexweş bûn, lê hebûn.

***Solfiroşê taxê, nexweşî ne xema wî ye. Ne rojekê dev û pozê xwe girtiye. Xuya ye ew karê emrê xwe li ber dikanê bibuhurîne; şev û roja bi serhev vekin û bidin wî û bidin wî û bêjin tu karî heta hetayê gav û saet li ber dikanê bî, wek ku xelata herî mezin a dinyayê bidinê. Ew deqekek neqedexekirî bibîne li dikanê ye.***

*Kalekî extiyar ê ji taxê, her li kuçan e, li sûk û li bazaran e. Rojên pêşî yê qedexeyê agir ji devê wî diçû. Carnan di qedexê de jî nedisekinî. Derdiket li nav taxê digeriya. Fortê xwe dikirin digot: "Tişt bi min nayê. Ev çi ye, nexweşî mexweşî tune ye!." Strana Ciwan Haco 'Kale kale' tê bîra mirov. Serê wî li dora wî zîz dibe. Wexta çav li jinekê dike devê wî ji hev dere. Her barebara wî ye "ev çi ye û weleh di hundir de nasekinim." Mirov difikire, ma ev ne şîdet be çi ye!?*

Du zarok, ber bi sûkê ve derin. Wexta tên nêzî qada azadiyê li hev vedigerin dibêjin wî! Ka maskeya me? Wê polîs me bigirin lo! Li xwe naheyirin bazdidin dikanekê. Li ber dikandaran digerin ka maskeyeke belaş. Radihêjin maskeyan û bi rev derin.

Jixwe bikaranîna maskeyan, li vir weke hobiyekê ye. Mirov nadin ber dev û pozên xwe. Ên bi guhê xwe ve dadileqînin, ên wek toqekê dixin stûyê xwe û ên weke bazin dixin zendên xwe… Lê ên didin ber dev û pozên xwe pir hindik in. Bikaranînek cuda a maskeyan jî derketiye. Mesela, yek here mêvandariya hinekan li derve li ber devê wan e, wexta tên hundir wek ku çakêtê xwe ji xwe bike, maskeya xwe ji devê xwe dike. Ku derin dikanekê jî wek ku berçavka xwe ji ber çavên xwe bikin, pêşî ji ber devê xwe didin alî û paşê dest bi kirîn û firotinê dikin. Ku ji dikanê derdikevin didin ber devê xwe. Wexta di rê de li ber dev û pozê wan be jî li hinekan bisekinin ji ser devê xwe dişeqitînin peyva wan xelas dibe, dîsa didin ber dev û pozê xwe. Hinek jî devê xwe digirin, pozê xwe li derve dihêlin.

Vîrûsa koronayê, serê me gişan pir êşand. Ew jî bûye dehê ser nehan ji êş û azarên me. Zêdeyî salekê ye dinya pê dilebike. Pê re jî guhertin jî çêbûn, Wekî dersekê bide mirovan bêje werin ser hemdê xwe. Mirov xistin qeysekê; zêde xeş nekin, rojê çend caran dest û rûyê xwe bişon. Dûrî hev bisekinin, bila hewa we nere ser hev û pir tiştên din. Ev pêkanînî baş bûn, lê meriv nabêje hela çêkê hat. Helbet başiya nexweşiyan tune ye. Jixwe ew bi peyva neyîniyê dest pê dike ne-xwe-şî.


Tovê zilmê, şîdet û û qeyranan jî bi vîrûsa koronayê re şîn hat. Serdestên li Kurdistanê jî ji xwe re fîrset dîtin, li hemberî siyaseta kurdan, jin û muxalîfan, pêşîlêgirtin û şîdet zêdetir kirin û ji bo zindanan zagonên nû derxistin. Hîn bêtir derî li ser girtiyan dadan. Ji bo deng nekin devê mirovan ne bi maskeyan bi negotinê ve girêdan. Vîrûsa koronayê kirin bahaneyek li hemberî xelkê bikaranîn. Da xelkê bitepisînin da li hev kom nebin da nefikirin.

Jina femînîst nivîskar û teorîsyen Sîlvîa Federîcî di nivîsa xwe ya "sermayedarî, ji nû ve hilberîn û karantîna"de sedemên balkêş bi rêz dike. Nivîs xîtabî jinan dike lê tiştên ew destnîşan dike hemû mirov dikarin dersekê jê derxin. Sîlvîa dibêje; "Em di nav pergaleke sermayedar (kapîtalîst) de dijîn. Carê bi hawekî mirovan dikujin; şer, koçberî, mirovên bêwar tên hiştin, talana xwezayê, ava qirêj, çandiniya pîşesazî (endustrî) û xwarinên hazir rê li ber mirinan vedikin" û balê dikişîne ser hejmarên zêde yên mirovan ku ji ber nexweşiya şekir, pençeşêrê û zekemê dimirin. Ew dibêje; "Vîrûsa koronayê ji rengekî din ê mirinan e" û ji gor Sîlvîayê mirov tên kuştin. Ew dibêje ku sermayedar bi mana şewban mirovan tecrîd dikin, xwepêşandanên me ji hev belav dikin, jinan ji hev dûr dikin, tenê dihêlin û bêrêxistin dikin û dibêje ku armanca sermayedaran kêmkirina rihê hevpariyê (kolektivîzmê) ye…

"Xwepêşandanên me ji hev bela dikin" ev hevok li rewşa Kurdistanê tê. Ez behsa Bakur dikim û Rojhilat jî di heman rewşê de ye. Serdestên li Kursdistanê derdê wan ne vîrûsa koronayê, derdê wan kurdan bîtepisînin. Çend ciwanan li ba hev bibînin hema bi qemçika wan digirin di bin 'qedexeyên' ji nehê êvarê heta pêncê sibê ma tên çi wateyê? Gelo ne ji bo tevgerên jinan û ciwanan asteng bikin? An jî tevgerên şoreşgerî li bajaran…!

Ez fikrên Sîlvîayê di vê der barê de di cih de dibînim. Li ciyên şer, kaos û talanên xwezayî hebin çi bibe wê bibe. Mirov bawer dike her tişt bibe û biqewime jî. Mirov bawer dike kevir jî bibarin. Çi nexweşiyên dertên ne jixweber in helbet ji ber tiştekî derketine. Çîrokek derketina wan heye. Peyva "belkî heyfhilanîna xwezayê be" pir dikeve serê min. Ma nabe xwezayê şîmaqek li mirovan xistibe ji bo bes talanan bikin. Ez nabêjim vîrûsa koronayê tune ye, lê fikarên min li ser zêdebûna vîrûsa koronayê zêde ne. Heger bixwestana ew ê ji serê pêşî de çareyek jê re bidîtana.

Bi ya min dinya zindaneke servekirî ye! Kovîd-19 jî jûreke vê zindanê ye.





Kurdistan Lezgiyeva

# Cîhana lîberal û rewşa Rûsyayê

Biyografiya her kesî, çîroka pêşbaziya di navbera du prensîbên wî yên entegre de ye: giyanî (hewldana ji bo zanînê, afirînerî, dad, hêjayî) û fizyolojîk (hewldana ji bo kêfa fizîkî, qezenc, hêz).

Dîroka mirovahiyê, tekoşîneke li dijî xirabiya ku ji hêla daxwazên mirovî ve hatine çêkirin, bi rastî, bi bingeha fizyolojîk a kesayetiyê ye. Hemû serhildanên mezin - komplo, şoreş, şer, bi berjewendiyên kesên taybet ve, daxwaza wan a bidestxistina hêzê, berjewendiyên madî ve girêdayî ne. Wek gotina rahîbê sereke Fario ya ji pirtûka Monte Crîsto: "Xirabî nayê têkbirin, ji ber ku şerê li dijî xirabiyê jiyan bixwe ye", vê rastiyê nîşan dike.

Afirînerê ramana lîberal û bi giştî fikra azadîparêz a filozofê îngilîz John Locke bû. Ew yekemîn kes bû ku mafên mirovî yên xwezayî wekî nirxên civakî yên herî jor -mafê jiyanê, azadî- bi nav kir. Wî têgeha milkê taybet wekî parçeyek van mafan destnîşan kir. Di heman demê de, wî diyar kir ku li ser "mal" dest nayê dayîn û divê ji hêla dewletê ve were parastin. Bandora dewlet û dêrê ya li ser jiyana civakê divê bi qanûnan were sînorkirin.

Elîta Rûsyayê di nav elîta lîberal a cîhanî ya bijartî de, bi şertên ku ji wê û welêt re tên pejirandin nehatin qebûlkirin. Hemû pêşveçûnên din bi vê rewşê ve girêdayî ne. Ji sala 1992'yan ve, Yekitiya Soviyetê dev ji hebûna xwe berda. Elîtên rûs, Rûsya xist nav çekên lîberal ên cîhanê.

Rûsyayê xwe li hawirdorek dijminane ya kolektîf a Rojava û komarên Sovyeta berê dît. Leşker û baregehên NATO'yê li nêzîkî sînorên wê hatin bicihkirin.

Rûsyaya lîberal bi rastî heman modela lîberal-demokratîk wekî Dewletên Yekbûyî û Ewropaya Rojava dişopîne. Ew aboriya xwe li gorî heman qanûnên sûkê bi pêş dixe, sermayeya Rûsyayê ji pargîdaniyên cihêreng re vediguhêze.

Yekitiya Dewletên Sovyetê ku xwediyê modeleke civakî-aborî ya cuda bû, ji ber ku bi hebûna xwe cîhana lîberal tehdît dikir, hebûna wê hat sekinandin.

Li cîhana lîberal, her tişt bi hev ve girêdayî ye -heger kesek dewlemend bibe, divê kesek din xizantir bibe û ev ji hêla herikên darayî ve ku bi rasterast an neyekser ji hêla Rezervên Federal a Dewletên Yekbûyî ve tên kontrolkirin, tên diyarkirin. Di bin van mercan de avakirina Rûsyayeke lîberal a serfiraz bi tevahî pûç e. Ew ji hêla rastiyê ve bi sînor e ku hemû cihên "di bin tava rezervên federal" de li cîhana lîberal a berê ji hêla sendîkayên pêwendîdar ve hatine veqetandin û ewlekirin ve têkildar e.

Ji nû ve dabeşkirina cîhanê di rêza welatên dewlemend de tê wateya şer. Hem Rojava hem jî Rûsya bi xurtî amadekariya vî şerî dikin. Pirs tenê ev e; gelo dê gengaz be ku mirov jê bireve? Heger gengaz be buhayê lihevkirinê ji bo Rûsyayê wê çawa be?

Li gorî yek ji damezirînerên zanista "dewlet û hiqûqê"ê I. Îlyin, avakirina dewletek civakî ya dadperwer ku ji bo kesê wê maf bê dayîn ku xwe wekî kesek pir giyanîbûyî bi cih bîne û nakokî bi kesan re û berjewendiya giştî wê bi dadperwerî were çareserkirin, tenê di rewşekê de pêkan e; gihîştina asta hişmendiya giştî ku gengaz dike hewcehiya avakirina dewletek wisa pêk bîne. Pêdivî ye ku were zanîn, civaka rûs hêj fêm nekiriye ku li Rûsyayê guhertinek di modela civakî-aborî de hewce ye.

Her wiha pirsa gelo di cîhana lîberal de pêşerojek geş a Rûsyaya lîberal heye an na, dema ku piraniya welatiyan hêvî dikin ku bigihîjin standardek jiyanê ya mîna hemwelatiyên Ewropaya Rojava, ev pirs bê bersivek erênî dimîne.